

Yaqûb Axa: Serhildana Dihê

Axayê gelek gundên li quntarê çiyayê Çiravê bû Yaqûb Axayê Garisî. Di nav eşîra Garisan û eşîrên derdorê de ji ber xisleta xwe ya comerd, dilsoz, girêdayî ax û miletê xwe, li herêmê dihat hezkirin. Nedişibî axayên dîtir. Xwedî soz û bext bû, xayintî û bêbextî...**Mem Avba/R.8**



Paytexta Merwanîyan: Farqîn

Di vê xelekê de ez ê ji qala Meyafarqîn ango qala Farqînê bikim ku ji dewleta Merwanîyan re paytextî kiriye. Farqîn, navçeyê Amedê ye, lê bi dîroka xwe ya kevnare, şahidî ji guherîna gelek merheleyên dî-rokî yê benîademîyan re kiriye...**Agîd Yazar/R.12**



xwebûn

11-17 ÇILE 2021 HEJMAR: 56 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

Zivistan germ derbas dibe

Îsal demsala zivistanê ji her alî ve germ derbas dibe. Tevî ku zivistan e, li gelek deveran demeke dirêj e berf û baran nabarin û ji niha ve pirsgrêka avê derketiye holê. Her wiha rojevên civakî û siyasî jî germ in. Li girtîgehan çalakiyên greva birçîbûnê ku bi armanca rakirina tecrîdê hat destpêkirin berdewam e. Li kolanan jî çalakiyên ji bo pişt-

giriya greva birçîbûnê zêde dibin. Li Wanê bi çalakiyê girseyî hem banga yekitiya neteweyî hat kirin û hem jî piştgiriya ji bo çalakgerên greva birçîbûnê hat vegotin. Li aliyê din li hemberî tayînkirina rektorên qeyûm xwendekarên Zanîngeha Bogazîçiyê çalakiyên xwe didomînin. Li gelek bajaran jî çalakiyên piştgiriya tîni li darxistin...**R.3**

Ji rojnamegeran ditirsin

Hevserokê DFG'ê Serdar Altan der barê sedemên çewisandina rojnamegeran a li cîhanê de diyar kir ku yê li dijî kiryarên nebaş disekin û ji raya giştî re radigihînin rojnameger in û wiha got: "Lewma li ku dera cîhanê be, rojnameger nayên hezkirin. Pergalên dewletî rojnamegeran ji bo xwe wek talûkeyek dibînin. Dema tengav dibin êrîşî çapemeniyê dikin. Rojnamegeran derdest dikin û gelek caran jî wan di-avêjin zindanê. Her wiha li hin welatên ku demokrasiya wan pir kêr e, rojnameger tîni kuştin. Li aliyê din di nav rojnamegeran de aliyên herî mafê zêde mafên wan tîni binpêkirin jî rojnamegerên jin in. Li gorî rapora CFWIJ'ê...**R.7**



Hin şaşiyên me yê rast tîni zanîn

Zimanê kurdî-kurmancî her çend bi gelek xetereyan re rû bi rû dimîne jî, ji aliyê din ve di gelek qadên nivîskî de baş tê bikaranîn. Ev kêfxweşiyê mezin e. Ji ber ku di jiyana rojane de dora wî gelek teng bûye, ev yek jî ji bo pêşerojê xetereyê mezin e. Cihê mixabîniyê ye, hê ku hestên kêfxweşiyê li ser me sar nabin, di her qadan de gelek berfireh bikanîna kurdî-kurmanciyê ya şaş mirovan xemgîn dike. Şaşiyên rastnivîsa salên dawîn hatiye çapkirin ku weke wezekekê ketiye bedena kurmanciyê pûç dike û şaşiyên din jî lê zêde dikin, tev ev xeletî rê li ber...**Yaşar Eroglu/R.5**

Ziwanê sero çand vateyê nêmcetî

Helbet ina babete sero zafê çî vaciyeyî. Zafê çiyê ameyî nuştîş. Her kes kinarêk ra ina babete girawt xo dest û sero qal kerd. Wexto ke ma, çîyo ke ameyo nuştîş rê ewniyênî, kam ziwan de ameyo nuştîş wa bêro, xûsen ehemîyetê ziwanê sero vîndarîyayo. Tarîx de milleta ke bêziwanî ciwîyaya çin a. Semedê sey yew millete ciwîyayîş, ziwan her daîm şert bîyo. Semedê milleta xoserî bîyayîş zî ziwan xoserî şert bîyo. Ewtîya de ma behsê millet kenê. Dewlet ney. Dewlete beno ke wayirê zaf ziwanan ba. Ziwan, semedê...**Estareyo Aliqnaye/R.9**



Li pirtûkxaneyan 25 destnivîsên kurdî

Bi salan e zimanê kurdî bi zextan re rûbirû ye. Tevî van zextên diwar jî berhemên bi destan hatine nivîsîn gihiştîne roja me ya îro. Parlamenterê HDP'ê yê Wanê Mûrat Sarisaç, bi pêşniyarkirî berhemên bi kurdî yê ji sed-sala 16'ê emîn û vir ve hatine nivîsîn û pirtûkxaneyên lê ne anî rojeya meclisa Tirkîyeyê. Mûrat Sarisaç xwest Wezîrê Çand û Tûrîzmê Mehmet Nûrî Ersoy pirsên wî bibersivîne. Pirsên hatine pirsîn ev in; Berhemên bi destan hatine nivîsîn ku beşek girîng a wêjeya klasîk a kurdî...**R.11**

Saziyên dewletê kurdî diqewirînin!

Platforma Zimanê Kurdî (PZK), tîkildarî Saziya Zimanê Tirkî (TDK) ku li ser kurdî xebatan bi rê ve dibe li Cemiyeta Rojnamegeran a Başûrrojhat a Amedê civîna çapemeniyê li dar xist. Berdevkê platformê Şerefxan Cizîrî diyar kir ku ew wek platformê bi xemgînî dişopînin ku kurdî ji saziyên dewletê tê qewirandin...**R.3**

Seqema Çileyê

Dîsa salvegerek, dîsa çileyê sar û seqem, dîsa ricifa hem ji sermayê hem jî ji keserê. Berfa yekemîn a salê bariya îro. Ji nişkav de ew ricifa zivistanê cemed a li Parîsê tê bîra min. Ku mirov pê dernedixist ricifa çî ye, ka ji sermayê yan ji kesera dil tê. Ew deryaya ji mirovan ku ber bi darbestên her sê cangoriyan ve diherikin, ew bêdengî û şîna esmana spî, berf û zemheriya ku li me dibarand, kelekela dilê mirovan...**Munewer Azizoglu Bazan/R.2**

Li Parîsê edalet qetilkirin

Di meha kanûna 2013'an de derket holê ku dadgerê doza Parîsê di lêpîrsîna Omer Guneyê de tetikêş de xwestiye hin agahiyên berfirehtir bi dest bixwe lê belê ji ber ku îstîxbarata Fransayê di vê...**Felemez Ulug/R.6**



Termînolojiya derûnnasiyê ava dikin

Kar û xebatên kurdî yê nivîskî her diçe barfireh dibin. Kovargeriya kurdî jî yek ji wan qadan e ku hejmara wan li pirtûkxaneyayê kurdî zêde dibe. Kovara *Psychology Kurdî* ev demê e bi hejmarên xwe yê nê hêreng bala xwînerên kurdî dikişîne. Kovar heta niha 11 hejmar hatiye çapkirin. Edîtorên kovarê balê dikişînin ser girîngiya xebatên li ser derûnnasiyê û diyar dikin ku aramancan wan avakirina termînolojiya derûnnasiya bi kurdî ye...**Hevpeyvîna Bêrivan Kayî / R.4**



Rêveberiya Xweser nimûneyek baş e

Cigira serokê USCIRF'ê Nadîne Meneza tîkildarî Rêveberiya Xweser û sûcên dewleta tirk ên li herêmên Sûriyeyê yê dagirkirî de axivî. Cigira serokê USCIRF'ê Nadîne Meneza wiha got: "Ez avabûna Rêveberiya Xweser li herêmên ereb ên xwedî taybetmendiyên olî piştî ku ji DAIS'ê rizgar bûn, dibînim tiştêk gelek xweş e. Pirrengiya nijadî, wêkheviya di navbera her du zayendan de li ser tevahiya astan ew beş in ku di rêveberiyê de nayên parçekirin. Ev demokratîkbûnê rê dide gel ku nêrînen xwe parve bikin. Ev yek jî li Rojhilata Navîn, rêveberiyê ku nû ye." **R.7**

Zaroktiya min kuştin, firotin ne bes bû navê min guhertin!



Şinda Ekrem

Dema min dît ez hembêz kirim û bi zimanê Şingalê got ez li vir pir qenc im (wate 'li vir pir baş im').

Çavên wê tijî hêstir bûn, lêvên wê ji kêfa dilerizîn, ew rojek bû ku piştî 7 salan kirasê reş li ser xwe hilandibû, porê wê yê hingivîn xelxelokî li ser milê wê kaş bû.

Ez behsa keça 19 salî Asîma Casim dikim ku dema çeteyên DAİŞ'ê di 3'yê Tebaxa 2014'an de bi hovane êrîşî Şingalê kirin ku wê wextê Asîma bi temenê xwe 11 salî hat revandin.

Di dîrokê de fermanên ku salên 1029, 1056, 1085, 1119, 1133, 1158, , 1802, 1803, 1805, 1808, 1817, ,1914, 1925, 1935, 2007 ev hin sal in min nivîsîn û fermana herî dawî ya 73'yan di 2014'an de pêk hat.

Di her komkujiyekê de bi hezaran êzidî bi şewitandin, serjêkirin, darvekirin û lêdanê dihatin qetilkirin.

Kurdên êzidî wê komkujiyê weke mezintirîn fermana di sedsala 21'ê de bi nav dikin. Li dora hezare 280 êzidî hatin qetilkirin, 2 hezar 300 zarok sêwî man, 70 ziyaret hilweşîyan, 6 hezar û 400 êzidî ku piraniya wan jin in, hatin revandin. Bi hezaran malbat perîşan bûn ku gelek koçberî Ewropayê bûn. Heta niha 3 hezar û 400 kes hatine rizgarkirin û yê mayî jî 2 hezar 873 kes hîn çarenûsa wan ne diyar e.

Jinên êzidî di bazarên Sûriye û Iraqê de hatin firotin ku yek ji wan jinan Asîma bû.

Asîma destpêkê serpêhatiya xwe wiha got : "Zaroktiya min kuştin, ez 3 caran hatim firotin ev ne bes bû navê min jî guhertin pir zalim bûn."

Hema bi carekê me dît her kes derket derve û dest bi bezê kirin. Ez reviyam gel malbata xwe, li ser rê DAİŞ ket pêşiya me, dema em girtin dengê qêrîna dayika min hîn di guhê min de ye, 'min bikujin zarokê min berdin'

Bi van gotinan Asîma ku niha li mala yek ji rêveberê mala êzidiyan li gundê Berzan ê bajarê Heseke dimîne û bandora zimanê erebî lê bûye, bi zimanekî kurdî şikestî dilê xwe yê ku ji êş, zilm, tirs û nebaşiya çeteyên DAİŞ'ê ku ev 7 sal in ji destekî radestî yê din bûye cara yekem serpêhatiya xwe parve kir: "Havîn bû ez û zarokê cîrana li taxa xwe ya Şingalê ya bi navê Berberoj bi hev re li ber sîka dîwarê malê rûniştibûn, hema bi carekê me dît her kes derket derve û dest bi bezê kirin. Ez reviyam gel malbata xwe, me çawa bazda nizanîm, li ser rê DAİŞ ket pêşiya me, dema em girtin dengê qêrîna dayika min hê di guhê min de ye, 'min bikujin zarokê min berdin'."

Seokinî, kelegirîn ket qirika wê

Asîma tevî malbata xwe jî Şingalê hatin revandin. Paşê çeteyan ew û hinek jinên din ku hatibûn revandin, ber bi navçeya Til Eferê ve birin. Li wê derê ew jî malbata wê dûr dixin û tenê bi hin jinên din re li dadgeha DAİŞ'ê dimînin û rastî tundî, heqaretê tî, ne bes bû destê wê şewitandin bi hinceta 'tatoş (deq) qedexe ye'. Ji wê rojê ve tu agahiya li ser malbata xwe nizane.

Li Til Eferê tê firotin û ji wir dibin bajarê Reqayê yê Sûriyeyê. Li wê derê çiroka êş û zehmetiya Asîma dest pê dike. Navê wê li Reqayê jî aliyê çeteyên DAİŞ'ê ve tê guhertin û navê Zeyneb lê tê kirin. Piştî 2 salan, ji bajarê Reqayê ew dibin Dêrazorê (Meyadîn) û ji wê derê ber bi gundê Sûsê paşê jî Baxozê ve dibin.

Asîma li wir her roj bi darê zorê fêrî xwendina quran û limêjê dibe

û piştî salekê jî hêla çeteyekî DAİŞ'ê ve tê kirin ku ew cara sêyem e tê firotin .

Asîma ku navê xwe bû Zeyneb ew demek bû dibihîst ku hin kes bi navê kurdan êrîşî çeteyan dikin û dibêje: "Min xwe jî rizgarkirina ji çeteyan re hazir kir. Ez li hêviya hatina wan mam da ku ez dikaribim birevim."

Ji kampê direve

Asîma wiha didomîne: "Dema em ji Baxozê rizgar bûn, min newêrî ji HSD'ê re bêjim ez jineke êzidî me, hîn tirs di dilê min de hebû ku DAİŞ vegere û serê min jêke, ji ber li pêş çavên min serê gelek jêkirin. Bi tirs ez derbasî kampa Holê bûm, ez û lawê xwe yê 3 mehî di konekî de bûn, pêvî zimanê erebî min yek gotin nedikir, piştî 9 mehan ku her roj li kampê jî aliyê jinên emîrê DA-

IŞ'ê ve kes dihatin kuştin, ji tirsê ez ji kampê reviyam û min berê xwe da bajarokê Bûseyra yê Dêrazorê. Li wir min xwe dexilê malekê kir, min ji wan re got ez ê ji were kar bikim. Piştî hefteyekê li nexweşxaneyê bajarokê Bûseyrayê fêrî hemşertiyê bûm, min nêzî 5 mehan li wir kar kir."

Asîma bi rêya hin kesan nas dike ku kesên xwe digihînin asayîşê dikarin bigihîjin malbatên xwe. Asîma biryar dide ku xwe radestî asayîşê bike û xwe digihîne asayîşa Heseke.

Piştî ku asayîşa Heseke teqez dike ew jineke êzidî ye ji aliyê asayîşa jinan ve radestî mala êzidiyan a Heseke tê kirin. Asîma li vir ev 7 sal in di nav zor û zehmetiyan de dijî, li bendê ye ku kes jî malbata wê ya ku tu agahiyan li ser wan nizane pê re biaxivin û ew vegere Şingalê.



Biyar

Munewer Azizoglu Bazan

Seqema Çileyê amadekariyên çalakiyê

Ji nav amadekariyên çalakiya salvegerê serê xwe bilind dikim. Hema bêje her tişt amade ye. Gelo dê hewa çawa be? Par çirayên me ji ber bayê tefiya bûn. Pêrâr jî ji bayê pankart bi hewayê ketibûn. Li rewşa hewayê dinêrim. Baran xuya nake. Nizanîm çima ji sibatê re gotine "sebatoka dînik". Çile hîn jê xirabtir e. Meheke bixwe ji canê xwe aciz...

Dîsa salvegerê, dîsa çileyê sar û seqem, dîsa ricifa hem ji sermayê hem jî ji keserê. Berfa yekemîn a salê bariya îro. Ji nişka ve ew ricifa zivistana cemed a li Parîsê tê bîra min. Ku mirov tê dernedixist ricifa çî ye, ka ji sermayê yan jî kesera dil tê. Ew deryaya ji mirovan ku ber bi darbestên her sê cangoriyan ve diherikin, ew bédengî û şîna esmanê spî, berf û zemheriya ku li me dibarand, kelekela dilê mirovan, xumexuma ligan, ax û hêsîrên ji ser rûyê dayikan diheliyan, yeko yeko ji ber çavên min derbas dibin. Çalakiya îsal û amadekariyan difikirim. Em ê çalakiya xwe îsal bi findan bikin. Ji ber koronayê her der girtî ye. Divê her kes findên xwe bi xwe re bîne. Em wêneyên hevalan li ser tûrikên derdora findan bixin, ew ê rûyê wan şewqê bide şevê.

Kî gotibû di sedsala 20'emîn de herî zêde salek berdewam dike êşa li dû windayan? Çi gotineke ne di cih de. Bila were vê yekê jî dê û bavan bipirse, ji rêhevalan, ji nasan û dostan... Dê jê re bêjin çend sedsal divê derbas bibe ji bo kelijandina birnê. Dikim nakim gotinên bavê Leylayê ku li Amedê ji girseyê re digot; "ez ê bistirim û bêjim 'kî bûk e, kî bûk e' hûn ê li min vegeerînin û bêjin 'Leyla bûk e' ji bîra min dernakeve. Rexneya xwe ya "jin divê nebin bûka Kurdistanê, ew têkoşerên axa xwe ne" vê keliyê bi gorî dikim.

Me alê her sê cangoriyan jî amade kirine. Yê ku li ser wan ji xeynî wêneyên Sara, Rojbîn û Ronahî "em edaletê dixwazin" dinivîsîn, bûn yek ji simbolên çalakiyên me. Seranserê salê pêl didin li asîmanên Ewropayê. Li e-peyaman dinêrim. Divê çalakiyê em belav bikin, lê dinêrim ku berî me gelek çavkaniyên din ên nas û dostan bange-waziya tevlibûnê kirine. Her kesî bi peyvên xwe bangewaziya çalakiyê kiriyê lê hemû bi "jin, jiyan azadî" dawî bûne. Sê jinên ku nav û sondên wan sînoren kurdan derbas kirine. Ew nota heval Rojbîn ku li ser lîstîka min nivîsandiyê, wek yek ji rêbazên têkoşînê diparêzim. Di civînê de bi cahillî min jê pirsî "ev çi rêxistin e?" Hem kurtaşiya rêxistinê, hem navê wê jî min re nivîsî. Waneya wê ya dawî ji bo min: muxatabên xwe nas bike.

Di meşê de muzîk jî hewce ye. Em li stran û helbestên ji bo wan hatine nivîsîn digerin. Bi soranî, kurmançî, dimilkî, bi nêwa û bêzîman û bêgotin ... "Eger le Parîs dejiyam" cara bédawî guhdar dikim: "Eger ez li Parîsê bûma / min ê neha wekî Eliya Macîd / cilên hemî jinên por zer û çav şîn ji wan bikira / û alaya Kurdistanê li wan bipêça..." Ger bizanibûna piştî wan çend jinên çav şîn û por zer bi ala Kurdistanê ber bi wan ve bi rê ketin... "Klama Dêrsim" jî hildibijêrim. Hema bi destpêkirina stranê da-diqurtim. 'Gula Elbistanê' jî divê kêr nemîne. Dîsa ji dil û bişîrîn difikirim, divê yek ji min re wergerîne. Bi devok û zaravayên wan cangoriyan bi bîr bînin. Stran û helbestên kurdî di roja Çileyê zivistana de ber bi esmanên ewropî ve bilind bibin. Divê ez li gotinan baş guhdarî bikim. Dibe ku ji nişka ve yekî/a por zer û çav şîn xwe nêzî me bike û bipirse, "ev stran/ev helbest behsa çî dike?" Ya rast hewceyî jiberkirinê nake. Ez ê bêjim "li xwe guhdarî bike, tu çî hest dikî, behsa hestên te dike."

Ya herî giran jî pêşwazîkirina naskirî û dostên heval Sara ne. Divê destmalan em ji bîr nekin. Me bangewazî ji wan re jî şand. Ji niha ve hilkehlka wan digihîje esman. Ez dizanim heval Sara bi heman pirsê li me vegere: "Hûn çûn serdana wan? We li halê wan pirsî? Heval, wan tenê nehêlin..." Em her sal serê Çileyê van wextan bi kêmasiya li wan nepirsînê û ew bi hestên ji heval Sara û şoreşê re kêmmayîne jî halê xwe re digirin.

Amadekariyên çalakiyê berdewam in. 8 sal in, heman Çile, heman zivistan, heman ricifandin...

Fermandar El Hura û stratejiya şer

Hedîl a bi nasnavê El Hura tê nasîn, di sala 1493'yan de li bajarê Şevşavîn ê Mexrîbê hatiye dinê. El Hura keça Mewlayî Elî di

dema xwe de bi jêhatîbûna xwe dihat nasîn. Tê gotin ku Mewlayî bajarê Şevşavîn ava kiriyê û pêşengê e dema xwe bûye. El Hura

ya li malbateke ronakbîr mezin bûye, jinek jêhatî û bixwebawer bûye. Bi qasî bixwebawerbûnê jî bedew û naskirî ye.

bajarê xwe jî êrîşan biparêze. Li gorî wê hêza deryayê parastina aliyên êrîşên deryayî bihêz dike. Teknîka şer li gorî behrê ava dike û artêşek weke hezên fedayî yê deryayê bi nav dike. Ew artêşê bi rê ve dibe û li hember spaniyan serî natewîne. Stratejiya şerê El Hura li spaniyayê tirsêk mezin çêdike. Di şer de El Hura li hemberî spaniyan bi ser dikeve.

Piştî ku El Hura di şer de bi ser dikeve û nahêla spanî welatê wê dagir bikin, gelê Şevşavîn El Hurayê pîroz dibînin û navê bajar dike El Huran. Êdî bajar bi navê weke Şevşavîn El Hura tê zanîn. Ji wê demê û şûn de êdî navê qehremana parastina bajarê xwe kirî, bi navê bajêr re dibe yek û ev nav li dîrokê tê nivîsîn.



El Hura bi fermadarek mezin ê artêşa Şevşawîn re dizewice. Di pêvajoyên şer û êrîşên ser bajêr de, fermandarê hevjinê El Hurayê rêveberiya îdarî radestî wê dike. El Hura demekê rêveberiya bajêr dike. Pêvajoya rêveberî û parastina bajêr di aliyê stratejiyê de bi pêş dikeve. Dema ku El Hura dibîne spanî dê êrîşî bajar bikin û ji aliyê êrîşên deryayî ve bi pêş ketine, li hemberî wan dikeve nav tevgerê dê çawa bikare

Li kolanan banga yekitiya neteweyî

Navenda Nûçeyan

Li Wanê bi pêşengiya Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û Teverga Jinên Azad (TJA) bi dirûşma "Niha dema yekitiya neteweyî û pêkanîna azadiyê ye" daxuyaniya yekitiya neteweyî hat dayîn.

Tevî hemû astengî û mudaxeleya polîsan jî daxuyanî li ber avahiya HDP'ê ya

Li Wanê bi çalakiyê girseyî banga yekitiya neteweyî hat kirin. Çalakvanan tecrîd şermezar kir û piştgirî da çalakiyên greva birçîbûnê û wiha hat gotin: "Tecrîda li girava Îmraliyê şermeke mezin e. Divê Tirkiye êdî bizane ku bi tecrîdê nikare biçe serî."

navçeyê Rêya Armûşê bi tevlibûnek qerebalix hat dayîn. Rêveber û parlamentêrên HDP'ê, rêveberên DBP'ê, aktîvîstên TJA'yê û nûnerên rêxistinên civakî yên sîvil beşdarî daxuyaniyê bûn.

Hevserokê KCD'ê Bedran Ozturk destnîşan kir ku divê tu kurd xerabiyê bi kurdekî din neke, divê tu hêzên kurd ji

bo berjewendiyên dewletên herêmî û serdest, êrişî tu hêzên kurd ên din neke û wiha axivî: "Her hêzên kurd ên li hember hesreta yekitiya gel û ruhê yekitiya neteweyî bin, armancên wan çî dibe bila bibe, hêza xwe ji ku bistînin bila bistînin dê her tim têk biçin. Em careke din li pêş çapemenî û raya giştî diyar dikin ku pey-

wir û berpirsîyariya gelê me daye ser milê me, em dê bi vê mebestê di rêya xwe de bimeşin û em hemû gelê kurd û siyaseta kurd vedixwînin ku bi van rêgezan tevbigerin."

Ozturk got ku dê tu caran zilmê nepejirînin, serî netewînin û wiha axivî: "Divê hemû gelên Tirkiyeyê û yên cîhanê bibînin ku kesên dijminatîyê li kurdan dikin dê têk biçin. Çûyîna li dû vê bloka ku dijminatîyê bîne. Bangewaziya me ji gelê me û hemû gelên Tirkiyeyê re ev e; bloka AKP û MHP'ê êdî hatiye dawîya emrê xwe. Divê ev bê dîtin û li gor vê tercîhê kirin."



Greva birçîbûnê didome

Çalakiya greva birçîbûnê ya ku li girtîgehên li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û bînpêkirinên mafan ên li girtîgehên hat destpêkirin, 6 hefte li pey xwe hiştin. Her wiha li Mexmûrê jî bi heman armancê greva birçîbûnê hatiye destpêkirin. Nivîskar Fûat Kav diyar kir ku girtiyên ku greva birçîbûnê dane destpêkirin careke din rola Ocalan ber bi çav kirine û ev bang kir: "Heke civak mil bide girtiyên û xetere têkoşînê saz bike, dê encam zûtir bê girtin."

Çalakiya grevên birçîbûnê

Ozturk bal kişand ser grevên birçîbûnê û diyar kir ku ger li girtîgehên bûyereke neyînî biqewime berpirsîyar hikûmeta tirk e û wiha domand: "Tecrîda li girava Îmraliyê ji bo Tirkiyeyê şerm û rûşeyîke mezin e. Ne mimkûn e ku ev pergal bê qebûlkirin. Em bang li rayedarên dikin ku demildest dest ji pêkanînan xwe yên keyfî û bêhiqûqî berdin û dawî li tecrîdê binin. Divê Tirkiye êdî bizane ku bi tecrîdê nikare biçe serî û ji ber vê yekê jî statuya taybet a ku li girava Îmraliyê li ser birêz Abdullah Ocalan û hevalên wî dimeşîne divê bi dawî bike."

Her wiha Ozturk biryara DMME'yê bi bir xist û bang kir ku hevserokê HDP'ê yê berê Selahattîn Demirtaş û hemû girtiyên siyasî serbest bînin berdan.



Kurdî ji saziyên dewletê tê qewirandin

Platforma Zimanê Kurdî (PZK), têkil-darî Saziya Zimanê Tirk (TDK) ku li ser kurdî xebatan bi rê ve dibe li Cemiyeta Rojnamegeran a Başûrrojhilat a Amedê civîna çapemeniyê li dar xist. Pêkhatiyên endamên platformê beşdarî daxuyaniyê bûn. Berdevkê platformê Şerefxan Cizîrî daxuyanî xwend.

Berdevkê Platforma Zimanê Kurdî Şerefxan Cizîrî diyar kir ku ew wek platformê bi xemgînî dişopînin ku kurdî ji saziyên dewletê tê qewirandin, ji aliyê saziyên fermî ve li ser kurdî berhemên zanistî nayên kirin, tiştên ku kurd dixwazin bînin kirin jî tînan qedexekirin û dixwazin

kurdî saziyan bi zimanê xwe xebat bikin.

Cizîrî daxwazên platformê wiha rêz kir;

* Li Amedê yan jî li Enqereyê şûbeyeke wan a kurdî vebe, li navenda wê şûbeyeke/kursiyekî kurdî vebibe

* Bikarkirina pisporên kurdî

* Xebata ferhenga kurdî ya berfireh

* Xebata ferhenga kurdî ya etîmolojîk

* Xebata ferhenga kurdî ya "Bîwêj û Gotinên Pêşyan"

* Weşandina ferhenga kurdî ya dijital

* Sazkirina Sempozyûma Kurdî ya avneteweyî

* Sê mehan carekê derxistina kovara "Rêzimana Kurdî"

* Weşandina berhemên rêzimana kurdî. **AMED**



Daraza tirk dibe mijara pêkenokan

Berdevka HDP'ê Ebrû Gunay li navenda giştî ya partiya xwe civîna çapemeniyê li dar xist û rojevên heylî nixand. Gunay biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ya ji bo berdana hevserokê diçûyî yê HDP'ê Selahattîn Demirtaş bi bir xist û bal kişand ser qebûlkirina îdianameya "Lêpîrsîna Kobanê" ku Demirtaş, Yuksedag jî di nav de ne, li dijî 108 siyasatmedarên kurd hat amadekirin.

Gunay got; "Ev îdianame nîşan dide ku dadgerî çawa ji aliyê desthilatdariya AKP-MHP'ê ve hatiye têkbirin. Îdianameya di çarçoveya lêpîrsîna Kobanê de hatiye amadekirin, encax bibe qapaxê kovarên pêkenokan"

Gunay diyar kir ku ev îdianame bêçaretiya desthilat-

dariyê jî radixe ber çavan û wiha got: "Heta yê wê bêhiqûqiyê dikin derkevin pêşberî mirovahiyê û hesabê sûcên xwe bidin, em ê têkoşîna xwe bidomînin. Partiya me li hemberî êrişan gav paşve navêje, berevajî bêhtir derbê li tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê dixê." **ENQERE**



Zanîngeha Bogazîçî li ber xwe dide

Xwendekarên Zanîngeha Bogazîçiyê, ji bo şermezarkirina Melîh Bûlû yê AKP'î ku weke rektor hat tayînkirin, çalakiya bînavber dan destpêkirin. Xwendekar li zanîngehê kom bûn û polîsan jî ji saetên serê sibê ve kampus dorpêç kir. Çend roj berê polîsan bi ser malên xwendekaran de girtin û 23 xwendekar binçav kirin. Xwendekar piştê serbest hatin berdan. Li Wanê jî xwendekarên Zanîngeha Yuzuncuyîlê bi pankartê piştgirî da çalakiyên xwendekarên Zanîngeha Bogazîçiyê. Her wiha li gelek bajarên jî çalakiyên piştgiriyê hatin lidarxistin. **STENBOL**

NÛJINHA'yê dest bi weşanê kir

Ajansa Nûçeyan a Jinan (NÛJINHA) ku bi pêşengiya Wekfa Çanda Medyayê ya Jinan ku navenda wê li paytexta Swêd Stockholmê ye dest bi weşana xwe kir. NÛJINHA dê weke dengê jinên Rojhilata Navîn bi zimanê kurdî, erebî, farsî, tirkî û îngilîzî weşanê bike. Her wiha di nav zimanê kurdî de bi zaravayê kurmancî û soranî weşanê tînin. Ajansê wiha got: "Di NÛJINHA'yê de jinên ku li pey heqîqetê dimeşin, li hemberî hemû qalib û zîmanên bûne kirde, dê bi hemû 'heyîn' û sadebûna wê bi nûçe û rêzenivîsan xwe bigihînin xwendevanên xwe." **AMED**

Rojnameger Aslan hat girtin

Di çarçoveya lêpîrsîna Serdozgeriya Komarê ya Antalyayê de polîsan di 5'ê çileyê de li Stenbolê avêt ser mala nûçegihanê Ajansa Mezopotamya'yê (MA) Mehmet Aslan û ew binçav kir. Aslan, piştî 4 rojên di bin çavan de sewqî dozgeriyê hat kirin. Aslan li dozgeriyê tiştên pê tawankirî red kirin. Dozgeriyê bi îdiaya "endamiya rêxistinê" Aslan sewqî dadgehê kir. Dadgehê jî bi heman îdiayê biryara girtinê da. Aslan birin Girtîgeha Antalya ya Tîpa L'yê. **ANTALYA**

Metîn Goktepe nehat jibîrkirin

Malbat, hembêşe û hevalên nûçegihanê rojnameya Evrenselê Metîn Goktepe, di 25'ê emîn salvegera kuştina Goktepe de ew li ser Goristana Esenler Kemer a Stenbolê bi bir anî. Gerîneyê weşana giştî yê Evrenselê Fatîh Polat anî ziman ku dema Goktepe nûçe dişopand polîsan ew binçav kir û wiha got: "Goktepe bi tundiya polîsan jiyana xwe ji dest da. Em ê di şexsê Metîn de rastiyan bigihînin gel." Xwişka Goktepe Meryem Goktepe jî peyama dayîka wî parve kir û wiha got: "Hûn Metîn ji bir nekin. Ez li ku rojnamegerêkî dibînim ez Metîn dibînim. Hûn hemû Metîn in." **STENBOL**

TRAWMAYÊN KURDAN BIRÎNÊN CIVAKÎ VEKIRINE Termînolojiya derûnnasiyê ava dikin

■ Bêrivan Kayi

Wek tê zanîn, xebatên bi kurdî û yên li ser zimanê kurdî di van salên dawiyê de her diçe zêdetir û mijar bi naverokên xurt berfirehtir dibin. Bi taybetî jî hejmara kovarên li ser sinema, avhewa, akademî, derûnnasî û hwd zêde dibin. Ev yek jî helbet jî bo zimanekî ku bi sedan sal in di bin êrişan de ye, serkeftinek e. Em vê hefteyê bûn mêvanê kovara Psychology Kurdîyê. Edîtorên kovarê dibêjin ku armanca wan a yekemîn ew bû ku ew zimanê kurdî di qada zanista derûnnasiyê de bi kar binin da ku dewlemendiya zimanê kurdî hîn bêhtir nîşan bidin.

Kovara Psychology Kurdî ji sala 2016'an heta niha weşana xwe didomîne. Hûn dikarin qala xebatên xwe yênc salan bikin?

Belê, rast e. Di îlona 2016'an de me dest bi xebatên xwe kir û ev pênc sal in em xebatên xwe didomîn. Me di destpêkê de bi dosyeya "zarok, şer û trawma" hejmara xwe ya yekem derxist û piştê re jî bi dosyeyên curbicur ên bi navên "dermankirina trawmayê", "şîn û şûn", "ziman û derûniya perwerdeyê", "derûnnasiya civakî", "made û bengîtiya madeyan", "kesayeti", "zarok û derûniya zarokan", "jin û derûniya jinan", "zayendî û civak" dom kir û herî dawî jî me bi dosyeya "koçberî û derûniya koçberiyê" hejmara xwe ya 11'an derxist. Em weke edîtoriyayê karên xwe bi rê ve dibin û ev edîtoriya jî pênc kesan pêk tê. Sê kes ji me derûnnas in û du hevalên me jî mamosteyê edebiyatê ne û li ser zimanê kurdî mastera xwe kirine û bi zimên mijûl dibin. Ji hejmara pêşî heya niha em xebatên xwe weke edîtoriyayê bi rê ve dibin. Nixandina nivîsan, diyarkirina navê dosyeyê, plansaziya naverokê û mijarên dîtir jî aliyê edîtoriyayê ve tê kirin. Wexta ku me dest bi vî karî kir, yek ji armanca me ya sereke ew bû ku em zimanê kurdî di qada zanista derûnnasiyê de bi kar binin da ku em dewlemendiya zimanê kurdî hîn bêhtir nîşan bidin. Em xebatên xwe bi vî hêzê dikin da ku em termînolojiyê derûnnasiyê jî ava bikin. Bi her hejmarê re em hêdî hêdî digihîjin armanca xwe ku me nêrî heye ferhengeke termên derûnnasiyê amade bikin.

Wexta ku em li kovarên kurdî dinêrin bi piranî li ser çand, huner, muzîk û hwd ne. Biryara çapkirina kovareke derûnnasiyê çawa derket?

Rast e piraniya kovaran di warê huner û zimên de ne. Jixwe mesele jî ev e; çima di qadên zanistên fenî û

civakî de kovar nebin, qey ziman têrî van qadan nake yan em serê xwe pê naêşînin? Piştî wê ku me bi biryareke rast kovar derxist, me jî bêhtir fêhm kir ku gelekî pêdivî bi xebatên wisa heye û ziman jî bi xwe re geş dikin ev xebat. Ji bilî ve çî derûnnas çî mamoste çî doktor hêmu bi wan mirovan re dixebitin ku bi kurdî diaxivin. Ger tu bi zimanê wan neaxivî tu dê çawa ya dilê wan fêhm bikî û ji wan re bibî derman. Gelo ev hêmu bo derxistina kovarekê ne bes in?

Nivîsên kovarê bi giştî ji wergerên îngilîzî, tirkî pêk tên. Çima rasterast nivîsandina bi kurdî kême?

Mixabin di vî de xeletiyek heye. Gava li hêmu hejmaran bê nêrîn dê xuya bibe ku rêjeya wergerê li derdora 20-25% e. Ne tenê jî îngilîzî û tirkî jî rûsî, almanî jî werger hene, yênc soranî jî werger in. Bi me ev hindik e û divê em zêdetir jî bikin. Werger jî bilî ku di nav di zimanan/çandan de pîrek e, zimanê armanc jî bi pêş de dibe, dewlemendiya wî nîşan dide. Termên nû dikevin zimên û bi vî awayî her nivîskarê qadê mecbûr namîne ku gava dest bi gotarekê kir li hemû ferhengên binêre. Ji ber vî nexasî bo me wergera jî hêmu qadên zanistî gelekî girîng e. Hewce ye em vî jî bêjin ku dosyeya rêjeya wergerê diguherîne lewra di hin mijaran de pêdiviya bi wergerê zêdetir e.

Hûn di kovarê de ji mijarên zarokan bigirin heta zayendê, li ser gelek mijaran disekin. Gelo hûn mijarên kovarê li gorî çî diyar dikin?

Em mijarên dosyeyê helbet li gorî hewcedariyên civakê diyar dikin. Bi her hejmarê û bi her dosyeyê em dixwazin ku civakê jê sûd werbigire. Me behsa dosyeyên xwe kiribû jixwe. Wexta ku hûn li navên dosyeyan binêrin, hûn ê bibînin ku mijarên wan bi rastî jî çiqas bi civakê ve girêdayî ne û bi civakê re eleqedar in. Ji ber ku rewşeke awarte hebû û ya rastî ew rewşê hê jî didome di dema koronayê de bo ku her kes xwe bigihîne jî bilî hejmarên me yênc çapkirî me hejmareke taybet jî li ser "vîrûsa koronayê" bi awayê online amade kir da ku her kes jê sûd werbigire. Ji bilî mijarên dosyeyê jixwe em cih didin nivîsên din ên der barê derûnnasiyê de jî. Em di her hejmarê de hewl didin ku cihê bidin mijarên bingehîn ên derûnnasiyê û pirsgirêkên derûnî yênc herî pir tên dîtir.

Civakên Rojhilata Navîn bi taybetî jî civaka kurd civakên trawmatîk in. Trawmaya civakî jî yek ji wan trawmayan e ku di nav civakê de berbelav û bibandor e. Gelo hûn



Bi her rûdanê re birîna ku nehatiye dermankirin, nehatiye jibîrkirin dîsa zirarê dibîne, mirov heman tiştî dubare dijîn. Mirin û windayî tiştên trawmatîk in. Ew hest nayên jibîrkirin. Mirov tenê dikare bi tiştinan mijûl bibe da ku jiyana xwe heya astekê normalîze bike

li Kurdistanê trawmaya civakî çawa dinirxînin?

Di trawmaya civakî de êdî bandora trawmayê ne tenê takekesî ye, di vir de trawma berê xwe dide civakê û hemû civak trawmatîze dibe. Kurd jî yek ji wan netewan in ku trawmayên civakî dijîn. Ev trawmayên wan ne jî ber karesatên xwezayî ne. Ev trawmayên ku kurd dijîn, gelek caran jî ber karesatên bi destên mirovan in. Ev rewşa ku pêk tê, jî bilî derûniya civakê tesîrê li hemû şert û mercên wan jî dike. Tesîrê li çanda wan dike, li rewşa wan a aborî dike, li siyaseta wan, nixwên wan, kevnoşopiya wan û hwd. Ev hestên tirs, xemgîni, bêhêvî, sûcdarî, bêçaretî, bixwenebawerî, tenêti, hêrsê ku kurd dijîn hemû jî van trawmayan in. Ev birîneke civakî ye û hê jî ev birîn nehatiye dermankirin. Hê ew tirs heye ku wê bênc qetilkirin, ji ci-hûwarên xwe bênc derkirin, bênc girtin. Mirov hê jî di talûkeyê de ne û xwe her tim di wê talûkeyê de his dikin. Rewşeke biewle tune ye û ya rast di qonaxeke wisa de jî tedawiya vî trawmayê zehmet e û wext digire. Divê

em vî jî bibêjin, bandora trawmaya civakî li ser hemû mirovan heman tesîrê nake. Kesên ku rasterast bûbin şahidên rûdanan tesîra trawmayê bêhtir dibînin, bêhtir his dikin û dijîn. Beriya trawmayê û piştî trawmayê ew civak ne heman civak e, tê guherîn.

Ji salên 80'yî vir ve bûyerên civakî yênc bûne sedema karesatên civakî didomîn; kuştin, girtin, binçavkirin, bêhişqûç, xerakirin û hwd. her hene. Dibe ku ev rewş bûne sedema re-trawmatizasyonê. Gelo hûn wek kovarekê vî rewşê çawa dinirxînin?

Wexta ku em li dîroka kurdan dinêrin, em dibînin ku berî salên 80'yî jî gelek rûdanên trawmatîk hene ku hatine serê kurdan. Weke rûdanên Koçgîrî, Agirî, Dersim û Geliyê Zilan. Jixwe piştî van jî gelek rûdan qewimîne û hê jî diqewimin. Di rewşa re-trawmatizasyonê an ku jinûvetrawmatizasyonê de jî ev heye. Bi her rûdanê re birîna ku hêj nehatiye dermankirin, nehatiye jibîrkirin dîsa zirarê dibîne û mirov heman tiştî dubare dijîn. Mirin û windayî tiştên trawmatîk in. Ew hestên ku bi we didin hiskirin tu carî nayên jibîrkirin. Mirov tenê dikare bi tiştinan mijûl bibe û tedawiyeke bibîne da ku jiyana xwe heya astekê normalîze bike, lê wexta ku te hê mirina lawê xwe, keça xwe, bavê xwe an xizmekî xwe jî bîr nekiribe, tesîra wê hê li ser te hebe û mezêlên wan piştê bênc talankirin, windakirin tu wê rewşa ku pêşî jiyayî dubare dijîyî, hemû keda te ya te bi çî zehmetî jî bo ku


hebekî normalîze bibe dabû jî holê radibe, tu tê yî seyra berê û tu dîsa trawmayekê dijîyî. Ev rewş bo kesên ku tên binçavkirin, tên girtin jî derbasdar e. Piştî ku tên berdan jî tesîra wê ya derûnî berdewam e. Ew tirs xwe di gelek tevgerên wan de nîşan dide. Jiyana wan nabe weke ya berê. Hewldanên wan yênc bo başbûnê bi binçavkirineke din, girtineke din, tadeyeke din li ber avê diçin û dubare trawmatîze dibin. Zû hêrs dibin, zû vediceniqin, nikarin xweş razên û xwarinê bixwin, her tim ew tirs heye ku wê rûdan dîsa bê serê wan, bo dahatûya xwe nikarin plansaziyeke bikin, xwe di ewlehiyê de nabînin, baweriya wan a li hemberî mirovan qels dibe, bêhêvî dibin.

Hûn bi giştî rewşa kovarên kurdî û naverokên wan çawa dinirxînin?

Li ser vî berweşê mirov dikare çend gotinan bêje ku roj bi roj kovar li me zêde dibin û ev kêfxweşiyê dide me. Van salên dawî kovarên bihekem jî derdikevin û bo belavbûna çand, ziman, xebatên kurdî deriyekî ber bi dinyayê vedikin. Her wiha kovarên der barê muzîk, sinema, moda, magazîne de reng didin ziman û çanda me. Lêbele xwendina bi kurdî kême, divê em vî jî binin zimên.

Tiştêke hûn lê zêde bikin hebe, kerem bikin?

Ji bo ku we ev derfet da me, em ji we û ji hemû kesan re spasîyên xwe pêşkêş dikin ku heta niha piştgiriya me kirine û dikin. Mala we ava.



Kovara Psychology Kurdî

Kovara Psychology Kurdî kovara yekemîn a bi kurdî ye li ser derûnnasiyê. Di sala 2016'an de dest bi weşana xwe kir û bi navê "Zarok, Şer û Trawma" yênc hejmara xwe ya yekemîn derket pêşberî xwendevanan. 10 hejmarên kovarê di bin banê weşanxaneyê J'ê de derketin, bi hejmara 11'an derbasî weşanxaneyê Avestayê bû. Edîtoriya wê jî pênc kesan pêk tê. Ji van pênc kesan, sê ji wan derûnnas, du jî wan jî mamosteyên edebiyatê ne.



Samî Hêzil

Hêvî

Hêvî wek xeyaletek li ber derfzanka giyanê mirov, timî li benda şilûkîna hundir, li derfetekê, li rê û rêçekê digere. Bi taybetî jî dawîya salan, ber bi rûpelên dawî yê salê dipere û tê û li derf dide; deriyê me, yan jî yê cîranên me, deriyê dilê me, deriyê hişê me. Xilasbûn jê tune, bivê nevê em ê bertekê nîşan bidin, çî bi rûyeke geş û bi camêrî û çî jî madtirş û bi fikir.

Mirov jî hêviyê xilas nabe. Sîsîpus bi hezar salan hêvî kaş kire jor, ta girika çiyê, lûtka çiyayê pîroz. Belkî xwestibe wê jî çiyayê bilind bigindirîne xwarê da ku hûr bi hûrî bike. Sîmir hêvî kir qûtê teyrar, pariyên wan bi hêviyê dagirt û ew xistin rêya hat û nehatê. Xwest ku bila hêvî di çîl-danka teyrar de bimehe û jê tişt nemîne. Hêvî jî me venabe. Di nav qutiya pandorayê de, ew qutiya wek bîrdank û dildanka mirovahiyê, maye û naçe. Çî cara ku mirov bi hîsa aramiyê, bi halxweşiya madî li cihê xwe kerr dibe, an jî bi hîsa têkçûnê êdî nikare bilive, gavişkî hêvî wî/wê vediciniqîne. Dîsa hêvî wek dostê berê yê nerihet banga serpehatiyê dike û bi dahola xwe li panîyên pê me dide. Helecanekê dixê çokên me.

Her çî hêvî jî me veneqete jî, wek benûşt bi qedera me ve girêdayî be jî, helwesta me ya dema rasthatinê wekî hev nîne. Hêvî wek peyv, wek gotin carinan dibe rûçik li ser rûyê me û daxwaza çî gotinê bi me çênake, hema bê-dengî. Car hene jî hêvî jî me re hema lêvbadan e, em xwe nagirin behsa wê bikin, qîmeta peyvekê nadinê. Gelo çî tiştê hêvî xirab kiribe, hêvî herimandibe li ber çavê me. Dibe sûcdar gotin be, gotina li ser zimanê sor, gotina bi şiklê xeberên req, gotina tijî hemaseta tehl û gotina wek klîşeyên genî û tev tiştên din ên kirêt.

Gunehê gotinê çî be jî, hebe jî, tunebe jî, tiştê hêviyê dixemilîne û tiştê ku mirov herî zêde nêzîkî hêviyê dike gotin e. Hêvî çawa tim li ber firsenda ketina hundirê dil û giyanê mirov be, mirov jî wisa bi gotinê, bi barê peyvyan, bi mifteya hevokan xwe bi hêviyê diceribîne.

Wa ye terîfa Arîsto: "Hêvî xewna li ser piyan e." Xewna şevê ba, hingê kêşe nedibû, wek pêlistokek jî bo binhişê me, wek dîmenekê kurt ku giyanê me pê sebra xwe dîanî, lê mirov di halê hişyar de, jiyane wek xewnek bibîne û bi vê xewnê şa bibe li nîveka mirovên hişyar bes ne di xewnê de, di nîveka mirovên ku heya qirika xwe di nav rasteqîniyê de çik bûne, cûmî nav berjewendiyên rîp û rast bûne.

Leonard Cohen rêya veşartî ya hêviyê dîtiye. Mêrikê şareza pê zaniye ku hema şeqek ziravîçkî jî bes e ji bo hêviyê: "Di her tiştî de şeqek heye. Di wir re ronahî dikeve hundir."

Mirovahî her çiqas qîmeta paşerojê bizane û wê tim bi hesta nostalgia bi bîr bîne jî, cihê hêviyê, an ku cihê pêşerojê reng e ku li serê jor e. Binêrin John Guare berawirdineke çawa bê hevsewî dike: "Misqalet siberoj bi têra xezîneya rabîrdû dike."

Mîzahe îngilîzan dîsa li ser kar e û bi xwarin û vexwarinê, bi hedonîzmeke saf terîfa hêviyê dike Francis Bacon: "Hêvî taştêyeke xweş e, lê şîveke sar e." Belkî jî dixwaze bibêje ku hêvî di dema hêvîkirî de biqîmet e. Hêviya dereng bi kêrî çî têt!

Oscar Wilde bi vê gotina xwe hêleke din a rastîya jiyana me û textê jor ê hêviyê dornîşan dike: "Em hemû di heman çelxaxê de ne, lê hinek ji me li stêrkên dinêrin."

Xanî di vê malika jêr de bi şehdemarê hêviyê girtiye. Nakokîya nav hêviyê, dûrbûn û nêzîkbûnê, hatin û çûnê, gihîştin û veqetîninê jê re dixwîne: "Hindî ku ji hicrê bê qerarim Ew çende ji te umîdewarim."

Bila gotina dawî ji Pablo Neruda be. Bila ew gotin dubare li rûyê zulmkarên tirsonek bikeve. Bila wek sîleya şermê şûna xwe bibîne û dewsa xwe ya pênc-tîlî çêbibe li ser rûyên rezîlan: "Hûn hemû kulîlkan bibirin jî hûn nikarin hatina biharê giro bikin."



Hin şaşiyên ziman ên em rast dizanin

Yaşar Eroglu

Zimanê kurdî-kurmançî her çend bi gelek xetereyan re rû bi rû dimîne jî, ji aliyekî din ve di gelek qadên nivîskî de baş tê bikaranîn. Ev kêfxweşiyeke mezin e. Ji ber ku di jiyana rojane de dora wî gelek teng bûye, ev yek jî ji bo pêşerojê xetereyeke mezin e. Cihê mixabîniyê ye, hê ku hestên kêfxweşiye li ser me sar nabin, di her qadan de gelek berfireh bikaranîna kurdî-kurmançiyê ya şaş mirovan xemgîn dike.

Şaşiyên rastnivîsa salên dawîn hatîye çapkirin ku weke wezekekê ketîye bedena kurmançiyê pûç dike û şaşiyên din jî lê zêde dikin, tev ev xeletî rê li ber yekgirtîbûn û afirandina mêjiyekî hevahengê kurdî digirin û zimanê nivîskî, di ber re jî zimanê axaftinê xira dikin. Divê her kesê ku xem û êşa zimanê kurdî dikîşîne li hember vê xirabûnê rihet nebe, xemên xwe bîne ziman, ji bo sererastkirina van yekan hewl bide. Di serî de jî zimanzan, herî zêde jî yê jî xwe re dibêjin zimanzan. Mixabin gelek ji wan tenê li xirabûnê temaşe dikin û xwe berpirsiyar nabînin. Çimkî tenê bazara gazinên, weke 'çima ziman nayê bikaranîn, hey hawar ziman ji dest diçe' heye, lê bila bê zanîn, tenê ne ew, ev xirabûnên em ê li jêr ser bisekinin û yê weke wan jî ziman ji dest dibin. Bi rastî peywira herî girîng a zimanzanan yek jî ev e.

Ez ê li ser bikaranîna şaş a hin navdêrên komanav rawestim. Çend mînak hene, dibêjin bes êdî bi me nelîzin. Navdêrên komanav weke *jin*, *kurd*, *pez*, *dewar* gava ji aliyê hin platformên kurdî ve, çî rêxistin, çî rojname-ajans-televîzyon, çî bi devkî tînen bikaranîn gelek xirabî li wan komanavan dikin.

Ji ber ku komanavên *jin* û *kurd* li qada siyasî hêmayên gelek girîng in û gelek jî tînen bilêvkin bûne hêmayên sereke û derketine pêş. Zimanê siyasî di nav kurdan de gelek fonksiyonel e; şaş an rast bikaranîna wî bi qasî giraniya xwe bandorê li ser zimanê giştî jî dike.

Bangeke min heye ji bo sererastkirina van şaşiyên, divê bang tenê li gel û siyasîmedaran neyê kirin; zimanzan û bikarhênerên ziman jî xwe berpirsiyar bibînin

Navdêrên *jin*, *kurd*, *pez*, *dewar* komanav in, bikaranîna wan hin taybetîyan bi xwe re tîne. Em gelek caran rastî hevokên wiha tîne, *pirsgirêka jinê pisgirêka civakê ya herî li pêş e*. Di vê û hevokên mîna vê de bikaranîna navdêra *jin* şaş e. Mixabin bi awayê şaş rûniştîye, hatîye qebûlîkirin. Dema wisa be tê wê wateyê ku *pirsgirêka tenê jinekê ya civakê ye*. Di kurmançiyê de *pirjimarî* bi serê xwe pêk nayê. Mînak wekî ku em bixwazin bêjin *'kadinlar'* em nikarin bi serê xwe vê tîgehê pêk bînin. Di bikaranîna hevokê de *pirjimarî* divê xwe bispêre navdêr an peyveke din, paşê dikare pêk bê.

Gava em rast bi kar bînin, em ê bêjin, *pirsgirêka jinan pisgirêka civakê ya herî li pêş e*. Pirhejmariya kurmançiyê rewşeke taybet e lê ji bilî wê weke komanav di gelek zimanên hind-ewropî de heman mantîq heye. Bi îngilîzî dibêjin, *women's problem*, bi fransîzî dibêjin, *problème des femmes*, bi almanî dibêjin, *frauen problem*. Yanî di van zimanan de jî weke kurdî bi awayê komanav yanî weke *pirsgirêka jinan* tê bikaranîn. Gava ku tê gotin, *çareserî di destê jinê de ye*, (wiha jî tê gotin, *çareserî di destê jin de ye*) weke jinek tenê çareseriyê pêk tîne tê fêmkirin. Her wiha dema bê gotin *pirsgirêka jin...* weke jin bi xwe bûye pisgirêkê tê fêmkirin.

Min gelek caran li ser mantîqa *pirjimarîya kurmançî* nivîsîbû. Naxwazim li vir dîsa dubare bikim. Bi kurtayî bêjim, hin taybetiyên zimanê kurdî-kurmançî hene. *Pirjimarî* her tim bi qalibekî pêk nayê. Carinan dem û bireser *pirjimarîyê* diyar dikin. Mînak, *jin êdî tîgehîştîye ku wê çawa tevbigere*, wateya vê hevokê yek jin tîgehîştîye ku çawa tevbigere. Helbet mebesta hevokê hemû jin in. Divê ya rast wiha be, *jin êdî tîgehîştîne ku wê çawa tevbigerin*. Li vir *pirjimarî* li

ser lêkerê pêk hatîye, ango weke *'jinan êdî tîgehîştîne ku wê çawa tevbigere'* jî nikare bê bikaranîn. Ji ber ku ne rast e.

Her wiha bikaranîna navdêra *kurd* jî bi vî rengî şaş e. Heman hevokê em wiha lê bikin, *'pirsgirêka kurd pisgirêka civakê ya herî li pêş e'*. Bikaranîna navdêra *kurd* şaş e. Rastîya hevokê ji aliyê rêzimanî ve wiha ye, *'pirsgirêka kurdan pisgirêka civakê ya herî li pêş e'*.

Dîsa hevoka *'kurd êdî tîgehîştîye ku wê çawa tevbigere'*, ne rast e. Mebest hemû kurd in lê hevok tenê kurdekî îfade dike. Rastîya hevokê wiha ye, *'kurd êdî tîgehîştîne ku wê çawa tevbigerin'*. Çawa me li jor jî bo *jinan* jî nîşan da, wisa jî ji bo *kurdan* nabe, weke, *'kurdan êdî tîgehîştîne ku wê çawa tevbigere.'*

Çavkaniya van şaşiyên bandora tirkî bixwe ye. Tirkî çand, ziman, civakê heta siyasî û perwerdeyê kurdiya me dorteng kiriye. Bi awayekî gelemperî zimanê siyaseta kurdan bi tirkî ye. Ji ber vê yekê jî pêşî her tiştî bi tirkî pêk tê, piştî yekser wergera wê bi kurdî dibe. Ji ber wê termînolojiya siyasîyê *pir girêdayî* tirkî dimîne. Gava behsa *pirsgirêka jinan* dibe yekser bi tirkî tê derdikeve rastê; 'kadin sorunu', nabe *'pirsgirêka jinan'*, dibe *pirsgirêka jin*. Bingeha wê bi tirkî ye û bi gramera tirkî xwe dide qebûlîkirin.

Kurdî sêwî û stûxwar li kêlekê dimîne û awayê şaş belav dibe heta Başûr, Rojhilat û Rojava, ew gişt jî di bin bandora zimanê siyaseta navendê de dimînin. Îca gava em ji devê siyasîmedareke rojava'yî, *'pirsgirêka jin'* dibihîzin diheyrin û serê xwe li diwaran jî bixin mîna gotina kalekî *'ha tu bêje Rosta'* ji me re dimîne û tiştêk jî ji dest me nayê.

Mixabin ev şaşî û gelek şaşiyên din weke ayetan li ziman hatine spartin, tu car terka wan jî nayê kirin.

Ez pê bawer im ku me hinek be jî şaşî da fêmkirin. Du komanavên me hene, *pez* û *dewar*; di wir de jî şaşiyê cuda pêk tê lê ji bîngeha xwe arîşeyê nêzî yê jor e. *Pez* û *dewar* du komanavên wisa ne ku her yek di nav xwe de gelek komanavan dihewîne. *Pez*, koma mîh, bizin, tiştîr, gîsk, kar, berx, beran, kavir, nêrî, hogeç, berindîr, mîstewr û hwd, *dewar*, koma ga, gamêş, çêlek, conega, nogin, golik dihevine. Hem *pez* hem jî *dewar* komanavên wisa ne ku di eslê xwe de *pirjimar* in lê weke *yeqjimar* tînen bikaranîn. Yanî navê komê temsîl dikin, weke *pirjimar* nayên bikaranîn. Her du jî *yeqjimar* û *nêr* in.

Pirî caran em lê rast tînen, dibêjin, *peza min wînda bûye*. *Pez* bi hêsanî wînda nabe. Dikare bê dizî an firotin. Mebest ji *pez* an mîh an jî bizineke yan dudu ne. Her wiha *pezên me* jî nabe, ji ber ku *jixwe pez* navdêrekî *pirjimar* e. Mixabin wiha jî tê gotin. Ev awa jî ne rast e. *Dewara te nehatiye garanê*. Mebest ji vê gotinê çêlekek an conega ye. Di bîngeha xwe de gotineke bi vî awayî ne rast e. Awayê rast ev e; *dewarê te nehatiye garanê*. Eger gelek hejmar ga, çêlek û canega nehatibin rast e, ji wan tenê yek nehatibe dîsa jî hevok şaşî tê bikaranîn.

Bikaranîna *dewar* û *pez* êdî *pir* nebe jî, di nav sohbetên nostaljîk de derbas dibin û hê jî bikaranîna wan ne kêm e. Belê dorhêla zimanê gundewar her diçe teng bibe jî kamilê ruhê zimanê me ye. Dema em ji bo tîgehîştinê dixitim tim berê xwe didin zimanê gundewar, tê de li rastîya zimanê xwe digerin.

Bangeke min heye ji bo sererastkirina van şaşiyên, divê bang tenê li gel û siyasîmedaran neyê kirin; zimanzan û bikarhênerên ziman jî xwe berpirsiyar bibînin. Êdî bes e ji temaşevaniyê re!

Li Parîsê edalet hat qetilkirin



Xweşkanî

Felemez Ulug

9'ê Çileyê sala 2013'an, li paytexta Fransa Parîsê li kolana La Fayette sê jinên kurd ên siyasetmedar Sakîne Cansiz, nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan û endama tevgera ciwanên kurd Leyla Şaylemez ji aliyê tetikîşê MÎT'a tirk Omer Goney ve hatin qetilkirin.

Ji roja bûyer qewimî, heya niha 8 sal derbas bûn. Li gel daxwaz û hewldanên kurdistanîyan jî failên esasî yê û komkujiyê tevî ku hemû îşaret hikûmeta tirk û rayedarên wê nîşan didin jî hê nehatine darizandin. Lêgerîna kurdistanîyan a ji bo edaletê dewam dike. Bi saya têkoşîna kurdistanîyan lêpîrsîna ku ji aliyê dozgeriya Parîsê ve hatibû girtin ji nû ve tê meşandin.

Ji bo em bikaribin der barê bûyerê de hafîzeyê xwe teze bikin, feydeya xwe heye ku em careke din li serboriya doza Parîsê binêrin.

Dozgerê Parîsê François Molins cara ewil di 21'ê çileyê 2013'an de, têkildarî komkujiyê hin hûrgilî aşkera kirin. Molins di axaftina xwe de îşaret bi kujerê sê jinan kir û got; "Roja bûyerê kesê bi navê Omer Goney heta nîvro gelek caran çûye avahiya li kolana La Fayette. Di îfadeyên wî kesî de nakokî hene û di çentê wî de jî şopa barûdê hatiye dîtin. Di dimênên kamerayê de xuya dibe ku ew kes bi vî çenteyî ketiye burroyê." Bi van daxuyanîyên Molins, navê Omer Goney wek kujer cara yekem hat rojevê.

Leptopa dozger didizin

Her çend daraza Fransayê der barê Omer Goney de ketûm bû jî medyaya kurd der barê Omer Goney de û tîkiliyên wî yê bi dewleta tirk re gelek belge bi raya giştî re parve dikirin. Piştî wê daxuyaniya dozger Molins di 23'yê îlonê de xwedê giravî hin kesên nasnameya wan nediyar ketibûn mala dadgerê anti-terorê Jeanne Duye ê dosya komkujîya Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez dişopand. Dizê bi armanca ji malê tenê leptopa dadger a tê de agahiyên 'hesas' ên tîkildarî dozê hebûn dizî.



Li gel daxwaz û hewldanên kurdistanîyan jî failên esasî yê û komkujiyê hê nehatine darizandin. Lêgerîna kurdistanîyan a ji bo edaletê dewam dike. Bi saya têkoşîna kurdistanîyan lêpîrsîna ku ji aliyê dozgeriya Parîsê ve hatibû girtin ji nû ve tê meşandin

Doz tê sekinandin

Di meha kanûna 2013'an de derket holê ku dadgerê doza Parîsê di lêpîrsîna Omer Goney ê tetikîşê de xwestiye hin agahiyên berfirehtir bi dest bixe lê belê ji ber ku îstixbarata Fransayê di vê mijarê de tu agahî nedane dadger ji ber wê doz xitimî. Di dema lêpîrsînê de derket holê ku Omer Goney weke ku nexweşiyên wî yê psîkolojîk hebin xwe li nexweşiyê datîne. Ji ber vê yekê ew radikin nexweşxaneyê, lê derdikeve holê ku ew ne nexweş e.

Lêpîrsîn bi dawî dibê

Parêzerê xizmên 3 jinên kurd ên li Parîsê hatin qetilkirin Antoine Comte di hevpeyvîna xwe de dide diyarkirin ku di lêpîrsînê de "pêşketinên mezin" hene û destnîşan kir ku lêpîrsîn Tirkiyê nîşan dide. Parêzer got, "Gelek guman hene ku dewleta tirk nîşan didin." Lêpîrsîna der barê komkujîya Parîsê de ku piştî bûyerê des pê kiribû di gulana 2015'an de bi dawî bû. Li gorî nûçeyê Ajansa Nûçeyan a Fransayê AFP'ê ya wê demê, eger alî di nav mehekê de li dij dernekevin, wê dozger berî destpêkirina dozê biryara xwe ya dawî bide. Li ser mijarê jî parêzerên bersûc Omer Goney Xavier Nogüeres ji AFP'ê re axivî û got, "Gengaz e ku lêpîrsîn ji ber kêmasiya hevkarîya navneteweyî û rayedarên tirk, yê ferman dane, nedîtîye."

Dadger agahiyên veşartî dixwaze

Der barê lêpîrsînê de beriya du salan bûyereke girîng qewimîbû. Di nîsana 2015'an de nepeniya li ser agahiyên di destê servîsa îstixbaratê ya hikûmeta Fransayê de, ji hin aliyên ve hatibû rakirin. Li ser daxwaza parêzeran dadgerê lêpîrsînê di îlona 2014'an de jî ji wezaretên pêwendîdar agahiyên veşartî yê îstixbaratê xwestibû. Dadger ji bo wê daxwaza xwe jî gengaziya tîkiliya xebatên Omer Goney bi MÎT'a tirk re nîşan dabû. Li gorî belgeyên polîsên fransîzî bi dest dixin bersûcê komkujiyê Goney, di sala 2012'an de gelek caran çûye Tirkiyeyê. Qeyda dengê bersûcê jî sê roj piştî salvegera komkujiyê, di 12'ê çileyê 2014'an de li internetê hatibû

belavkirin. Di qeyda deng de kujer bi du kesên jî servîsa îstixbarata tirk re qala planên cîneyetê dike.

6 hezar euro ji kujer re şandin

Piştî du rojan jî di 14'ê çileyê de belgeya fermana ji bo kujer a qetilkirina Sakîne Cansiz, hatibû weşandin. Di belgeya bi îmzeya rayedarên MÎT'ê de dihat ragihandin ku ji Omer Goney re ji bo 'lêçûnên gengaz' 6 hezar euro hatiye şandin û ji bo sîûqesta li hemberî Sakîne Cansiz ferman jê re hatiye dayîn. Tevî ku hemû belge û agahî Enqereyê nîşan dide jî li eniya Tirkiyeyê mukurhatin û astengî bi hev re dimeşin. Partiya li desthilatdariyê AKP û serkêşê wê Recep Tayyîp Erdogan ji komkujîya Parîsê hevkarê xwe yê berê Cemaeta Gulen ku weke 'rêxistinbûna paralel' pênase dike, sîûdcar kiribû.

Naxwazî agahî aşkera bibin

Dozgerê Fransayê hem li ber deriyê îstixbarata welatê xwe hem jî li ber deriyê îstixbarata Tirkiyeyê disekinî, lê her du servîsên îstixbaratê jî nedixwest agahiyên li ser tetikîşê aşkera bikin. Di tîrmeha 2015'an de dozgeriya Parîsê xwest Omer Goney li dadgeha cezayê giran bê darizandin. Li gorî nûçeyê Ajansa Nûçeyan a Fransayê (AFP) dozgerên ku lêpîrsînê dimeşînin biguman in ku MÎT'a tirk, komkujîya li Parîsê tehrîk kiriye yan jî tevî li karê amadekariya komkujiyê bûye.

Rojnameya Le Mondê

Dozgeriya Parîsê gişnameya xwe ya dawî di 9'ê tîrmeha 2015'an de da. Li gorî rojnameya Le Mondê dozger xwest bersûcê komkujiyê Omer Goney radestî dadgeha cezayê giran bê kirin. Rojnameya Le Mondê xwe gihand kopyayêke gişnameya ji 70 rûpelan zêde pêk dihat. Di wê gişnameyê de edaleta Fransayê dibêje ku rêxistina îstixbaratê ya tirk dibe ku tevî li vî cîneyeta siyasî ya li Fransayê bûye. Di lêpîrsînê de bal tê kişandin ser cihêtiya di navbera dewleta kûr de û li ser ihtimala 'darbeyêke komên muxalefetê yê dijberê pêvajoya aştiyê' jî radiweste. Dozgerî di giş-



nameya xwe de dibêje, "Gelek unsûrên di prosedurê de gumanan diafirînin, ku MÎT tevî li cîneyetê û amadekirina cîneyetê bûye hene."

Li gorî gişnameyê Omer Goney dema hat girtin, xwest ku agahî ji Sefaretxaneyê Bilind a Tirk a li Parîsê re bê dayîn. Ev yek jî rewşeke ku gumanan zêde dike ye. Parêzerê malbatên sê şoreşgerên jin ên kurd ên hatin qetilkirin Antoine Comte got, "Meqamên edlî, cara yekê ye di cîneyetêke siyasî de dewleteke biyanî ew çend bi awayekî vekirî nîşan dide û helwestê diyar dike, lê desthilatdariya siyasî hîn der barê wê dozê de daxuyanî nedaye."

Her çû hûrgilî zêdetir bûn

Der barê komkujîya Parîsê de di nîsana 2016'an de hin detayên din jî derketin holê. Bi qeyda deng û belgeyan derket holê ku kujerê sê şoreşgerên kurd Omer Goney ajanê MÎT'ê ye û bi belgeya bi mora Halûk Ozcan ve feramana sîûqestê wergirtiye. Piştî van hûrgiliyan û birêveçûna dosyeya komkujiyê dadgeriya Parîsê biryar da ku doz di navbera 5 û 16'ê kanûna 2016'an de pêk were, lê belê di 27'ê hezîranê de rewşeke cuda derket holê. Li gorî nûçeyê nûçegihana Yenî Ozgur Polîtîkayê Selma Akkaya, heyeta Dadgeha Cezayê Giran a Taybet, ji parêzeran re ragihandiyê ku doz hatiye taloqkirin. Biryara wê taloqê jî parêzeran re jî neahîtibû ragihandin. Li ser îtiraza parêzeran heyeta dadgehê bersiva 'em ne mecbûr in daxuyanîyê bidin we' dabû.

Mirina kujer a biguman

Doz di 23'yê çileyê de dest pê kir û heta 24'ê sibata 2017'an dê bidomiya. Di demeke de ku kurdistanîyan xwe ji bo tevîbûna dozê amade dikir di ajansên cîhanî de di 17'ê kanûna 2016'an de nûçeyek lezgîn hat belavkirin. Di nûçeyê de dihat gotin ku bersûcê komkujîya Parîsê Omer Goney li girtgehê miriye. Parêzerê Goney îdia dikir ku ji ber enfeksiyonê miriye lê parêzerên malbatan ji wê yekê bawer nekir. Parê-

zerê malbatên her sê jinên şoreşger Antoine Comte ji malpera Orîent XXI re axivî û got, "Mirina Omer Goney, ji bilî me bi kêrî her kesî tê."

Comte: Tirkiye ferman da

Comte da xuyakirin ku mirina Omer Goney bi kêrî dewletên tirk û Fransayê tê û got: "Di nav doseayê de gelek agahî û belge hene ku nîşan didin, Tirkiyeyê fermana komkujiyê daye. Ev mirov li ku dibin bila bibin, divê bersivê bidin edaleta Fransayê. Navê kesên tevî bûyerê bûne li ber destê me ne. Dozgeriya Fransayê bi rengekî vekirî, servîsên îstixbarata tirk sîûdcar kir. Di mijara cîneyetên siyasî de cara yekemîn dewlet weke berpirsiyarê cîneyetê hat nîşandan." Comte her wiha got, "Belê Omer Goney mir, lê belê divê ev yek were fêmkirin. Di nav dosyeyê de şîrîkên wî sîûcî û di asta siyasî de yê ferman dane hene." Parêzer Sylvie Boitel jî li ser kar û barên xwe yê niha û pê ve got, "Em ê îtirazeke nû bikin ji bo lêpîrsîn ji nû ve bê vekirin û dadgerekî nû yê lêpîrsînê bê wezîfedarkirin."

Rewşa dawî

Malbatên her sê şoreşgerên di komkujîya Parîsê de hatibûn qetilkirin piştî wê bûyerê di sibata 2017'an de li dozgeriya Parîsê giliyêke din kirin. Wan xwest ku her çend tetikîşê mirîbe jî di dozê de kesên fermana komkujiyê dane aşkera ne û daxwaza darizandina wan kirin. Piştî malbatan li dozgeriyê gişî kir di nîsana 2017'an de dozgeriya Parîsê biryar da ku lêpîrsîna wê komkujiyê ji nû ve dest pê bike.

Ji bo lêpîrsîn ji nû ve bê nixandin, dozgerê anti-terorê hat wezîfedarkirin. Parêzer Jean-Louis Malterre di 15'ê gulana 2019'an de ji ANF'ê re axivî û diyar kir ku lêpîrsîn hatiye vekirin û wê ji niha û pê ve li rola îstixbarata tirk bê pîrsîn.

Li gel di ser komkujiyê re 8 sal derbas bûn jî Kurdistanîyan bi helwesta xwe diyar kir ku wê nehêlin ser wê dozê were girtin. Bi saya têkoşîna wan ev dosye hê nehatiye girtin.

'Ji rojnamegeran ditirsin'

Heserokê DFG'ê Serdar Altan diyar kir ku ji ber rojnameger tiştên heylî ji raya giştî re radigînin, ji aliyê pergalê ve talûke tînin dîtin û got ku ji ber vê yekê ji rojnamegeran ditirsin

■ Bêrivan Kayi

Sala 2020'î wekî qadên siyasî û aborî di qada rojnamegeriyê de ji em dikarin bêtînin ku qeyranek hebû. Ji ber ku li çar aliyên cîhanê bi rewşa pandemiyê re êrîş, çewisandin û zextên li ser rojnamegeran her cûn zêdetir bûn. Li gorî raporên rêxistinên rojnamegeran jî di sala 2020'î de herî zêde rojnameger hatin kuştin, di bin zextandan man û hatin çewisandin.

Rojên borî gelek rêxistinên rojnamegeran der barê rewşa rojnamegeran a 2020'î de raporên xwe bi raya giştî re parve kirin. Li gorî Federasyona Rojnamegeran a Navneteweyî (IFJ) di sala 2020'î de li tevahiya cîhanê 42 rojnameger hatine qetilkirin. Piştî ev rapor hat ragihandin li Afganistanê rojnamegerêkî din ku muxalîfê rejîmê bû hat qetilkirin. Dîsa li gorî Rêxistina Rojnamegerên Sinorinas (RSF), li tevahiya cîhanê 387 xebatkêrên çapemeniyê girtî ne. Tenê ji bo nuçeyên xwe yê li ser vîrûsa koronayê 130 rojnameger hatine girtin.

Der barê raporên rêxistinên rojnamegeran û rewşa rojnamegeran a li cîhanê de, em bi hevserokê Komeleya Rojnamegeran a Dîcle Firatê (DFG) Serdar Altan re axivîn. Altan di axaftina xwe de da zanîn ku pergala kapitalîst ji rojnamegeran ditirse.

Yên herî mafên wan tînin bînpêkirin

Heserokê DFG'ê Serdar Altan derbarê sedemên çewisandina rojnamegeran a li cîhanê de diyar kir ku yê li dijî kiryarên nebaş disekin û ji raya giştî re radigînin rojnameger in û wiha got: "Lewma li ku dera cîhanê be, rojnameger nayên hezkirin. Pergalên dewletî rojnamegeran ji bo xwe wek talûkeyekê dibînin. Dema tengav

dibin êrîşî çapemeniyê dikin. Rojnamegeran derdest dikin û gelek caran jî wan diavêjin zindanê. Her wiha li hin welatên ku demokrasiya wan pir kême, rojnameger tînin kuştin. Li aliyê din, di nav rojnamegeran de yê herî zêde mafên wan tînin bînpêkirin jî rojnamegerên jin in. Li gorî rapora Koalîsyona Rojnamegerên Jin (CFWIJ) li tevahiya cîhanê 701 rojnamegerên jin rastî tundiye hatine. Dema mirov li tevahiya wan daneyan dinêre, dibîne ku pergala kapitalîst a cîhanî çiqas jî rojnamegeran ditirse. Ev yek jî mixabin pirsgirêkên mezin bi xwe re tîne."

'Ji rojnamegeran hez nakin'

Wek tî zanîn, hefteyên borî rêxistinên rojnamegeran ên wek RSF û CPJ'ê di sala 2020'î de ji Afganistanê heta Rûsya, Sûriya û Kolombiyayê 50 rojnameger hatin kuştin û vê yekê wek 'rekora ku herî zêde rojnameger hatine kuştin' penase kirin. Hevserokê DFG'ê Altan der barê vê mijarê de jî ev tişt anî ziman: "Em tev dizanin ku di xûsiyeta rojnamegeriyê de dijberî, yan jî muxalîfbûn heye. Dijberiya rojnamegeran jî li dijî tiştên ne di rê de ne. Yanî dema desthilatdariyek li ser civakê faşizmê pêk bîne, an zilm û zora xwe zêde bike, ya yekem rojnameger li hember wê disekine. Çawa li hember disekine? Bi nuçeyên xwe, bi rê û rêbazên ragihandinê van kiryanan deşifre dîke û bi raya giştî re parve dîke. Ev yek jî desthilatdaran aciz dîke. Her wiha dema ku raya giştî ya ker û lal hebe hêsantir dikarin karê xwe bi rê ve bibin. Rojnamegerê yekê qebûl nakin. Li dijî vê helwesta xwe diyar dikin û tiştê ji dest wan tînin dikin. Dema vî karî dikin rastî êrîşên xirab tînin, tînin kuştin, an jî rastî êrîşan tînin."



Rojnamegerên li Başûr

Serdar Altan di berdwamê axaftina xwe de dest nîşan kir ku di van salên dawî de li başûrê Kurdistanê jî her diçe zextên li ser rojnamegeran zêdetir dibe û wiha domand: "Yek ji cihên ku rojnameger herî zêde rastî pirsgirêkan tînin jî başûrê Kurdistanê ye. Ji ber ku rêveberiya Başûr jî wek kopyayekê xirab a desthilatdariyên totalîter in. Her wiha di vê çarçevê de her partiyeke çapemeniyek li gorî xwe ava kir û propagandaya xwe kir. Dema çapemeniyên cuda derketin holê, wê demê pirsgirêk dest pê kir. Yanî rojnamegerên bêalî wek tiştêkî xerîb hat dîtin û vê yekê bêtehemuliyekê bi xwe re anî. Niha dema em li başûrê Kurdistanê dinêrin di warê azadiya çapemeniyê de ferqa wan û Tirkiyeyê tune ye. Rojnameger tînin kuştin, girtin, cezakirin û xebatên wan ên qadê tînin astengkirin. Ev yek jî wek saziyeka rojnamegerî ku piraniya endamên me kurd in, me aciz dîke. Mirov dixwaze ku yek ji parçeyên girîng ên Kurdistanê ku sistemek federal lê heye, demokrasiya wê jî rûniştî be. Her wiha çapemenî jî azad be. Mixabin ev yek pêk nayê."

'Azadiya çapemeniyê tune ye'

Heserokê DFG'ê Altan bal kişand ser rewşa rojnamegerên li Tirkiyeyê û da zanîn ku li Tirkiyeyê tu demê azadiya çapemeniyê pêk nehatiye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Herî zêde di salên 90'î de Tirkiyeyê zextan her diçe zêde dîke û ev yek bi hikûmeta AKP'ê re gihîşt asteke bilindtir. Bi taybetî di deh salên dawî de zilm û zora xwe zêde kir û pergala ber bi faşizmê ve bir. Di 5 salên dawî de jî di warê çapemeniyê de derbeya herî mezin pêk anî û hema bêjin nehişt yek saziyeka çapemeniyê ya muxalîf bijî. Bi dehan ji wan hatin girtin, bi sedan rojnameger bi lêpirsîn û daweyan re rû bi rû man, hinek jî wan rastî êrîşên fizîkî hatin. Yanî mirov dikare bêje AKP jî bo dengê çapemeniyê bibire her rê û rêbazê bi kar anî. Helbet çapemeniya kurdî li hember êrîşên desthilatdariyê tim bi roleke girîng a berxwedêr rabû û ev yek jî bo hinekên din jî bû cesaret. Sala 2020'î jî bo rojnamegeran dîsa saleke zehmet bû. Li gorî rapora komeleya me, bi sedan rojnameger rastî pêkûti û bînpêkirinên mafan hatine. Ev yek jî rêjeya Tirkiyeyê di nav welatên cîhanê de dibe rêza herî dawî."

'Rêveberiya Xweser nimûneya herî serkeftî ye'

Komîsyona Amerîkayê ya Azadiya Olan a Navneteweyî (USCIRF) ya sala 1998'an hatiye avakirin, bi peywira ku der barê bînpêkirina mafên olî de xebatên berfireh ên li gorî standartên navneteweyî xebatên xwe dîke û li gor encamên xebatan jî pêşniyarên politîkayan ji bo serokdewlet, sekreter û kongreyê dikin.

Komîteyek ji komîsyona USCIRF'ê gelek caran serdana Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê jî kir û der barê nêzîkatîya Rêveberiya Xweser a li ol û baweriyên cuda yê li Rojava de raporên xwe yê salane bi serokdewlet û saziyên sivil ên li DYA'ê re parve kirin.

Cîgira serokê USCIRF'ê Nadine Meneza tînkildarî Rêveberiya Xweseriyê û sûcên dewleta tirk ên li herêmên Sûriyeyê yê dagirkirî de axivî.

Nadine Meneza da zanîn ku di serî de li herêmên xweser rewşa olan meraq kiriyê û bi wê kelecane bi projeya USCIRF'ê re hatiye Rojava û wiha got: "Ez avabûna Rêveberiya Xweser li herêmên ereb ên xwedî taybetmendiyên olî piştî ku ji DAIŞ'ê rizgar bûn, bîbînim tiştêk gelek xweş e. Pirrengiya nijadî, wekhevîya di navbera her du zayendan de li ser tevahiya astan ew beş in ku di rêveberiyê de nayên parçekirin. Ev demokratîkbûn rê dide gel ku nêrînen xwe parve bikin. Ev yek jî li Rohhilata Navîn, rêveberiyekê nû ye."

Sûcên tînin kirin

Meneza dest nîşan kir ku Tirkiyeyê jî bo Rojava dagir bike PKK'ê wek hincet û şênîyên Rojava jî wek terorîst nîşan dide û wiha pêde çû: "Ya rast ew e ku Tirkiyeyê bi terorîstan re dixebite. Her wiha çeteyên DAIŞ'ê yê berê, niha parçeyek ji Artêşa Sûriyeya Azad in. Komên ku Enqere piştigiriyê dide wan, li dijî ol, etnik û jinan sûcên hovane dikin. Ev sûc, ji hêla gelek rêxistinên navneteweyî ve hatine belgêkirin."

Çirok kom kirine

Cîgira USCIRF'ê Nadine Meneza derheqê encam û naveroka civînên tevî wan bûye de diyar kir ku heta niha bi gelek endamên senato, karmend, rêveberên sivil, oldar û berpirsên hikûmetê re parve kirine û wiha got: "Min çirokên jiyana şênîyên ku beriya êrîşên DAIŞ'ê û dagir kir, jiyana wan a niha yê li herêmên Rêveberiya Xweser a Demokratîk kom kirin û bi gelek aliyên re parve kirin. Di rastiyê de, ez hinekî şokê dimînin ku heta niha kesek şewaza Rêveberiya Xweser nas nakiriyê. Carekê ez bi berpirsekî re rûniştim, lê agahiya wî tune ye ku Rêveberiya Xweser piştî êrîşên dewleta tirk hîn li ser pêyan e. Asta rêzdariya ku Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD)



girtiyê û çawa DAIŞ'ê tune kir, nizane. Di rapora salane ya USCIRF'ê de ku di nîsana par derketiyê, me wesiya kir ku divê hikûmeta Amerîkayê piştevanîya Rêveberiya Xweser bike. Em pir bi çêş in ku vê yekê bibînin. Ew dê gotina ku tenê Amerîka wek artêş li herêmê ye divê biguhere."

Divê stratejî biguhere

Nadine Meneza bal kişand ser sûcên ku Tirkiyeyê rojane li herêmê dîke û ev tişt anî ziman: "Yek ji sedemên serdana min a herêmê, balkişandina ser sûcên ji hêla dewleta tirk a dagirker ve li herêmên dagirkirî dîke, bi taybetî yê li dijî êzîdî, xiristiyan, kurd û jinan, lê ji ber 'sedemeka nediyar', DYA û civaka navneteweyî van sûcan jî nedîtî ve tî. DYA'yê wek bertekê li dijî rejîma Esad her tim piştigiriyê hevalbendîya opozîsyona Sûriyeyê kir ku dewleta tirk desteka wê dîke. Dema ez li Sûriyeyê bûm, serokê Îtîlafa Niştîmanî ya Hêzên Şoreş û Opozîsyona Sûriyeyê Nesir Herîrî, serdana Efrînê kir û pesnê azadiya olî ya li wir kir. Piştî wê bûyerê dimenek Herîrî bi Hatim Ebû Şaqra re yê dema kuştina Hevrîn Xelef amade bû, belav bûn. Li gorî agahiyan nû, divê hikûmeta Amerîkayê stratejiya xwe ya taybet a li hemberî Sûriyeyê biguhêrine."

Rêveberiyekê serkeftî

Her wiha Meneza da zanîn ku Rêveberiya Xweser li Sûriyeyê hikûmeta serkeftî ya tekane ye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Rêveberiya Xweser beşek mezin an Sûriyeyê bi rê ve dibe, ji ber vê yekê divê beşeke çareseriyê bê dîtin. USCIRF'ê şîret li hikûmeta DYA'yê kir ku divê Rêveberiya Xweser li gorî biryara NY'ê ya bi hejmar 2254'an, tev li danûstandinên Cenevreyê bibe. USCIRF li hikûmeta Amerîkayê pêşniyar kir ku ji aliyê siyasî ve bi Rêveberiya Xweser re weke hikûmetekê herêmî û rewa danûstandin. Heta niha ji bo gelên Sûriyeyê pêşniyarîya çareserîya pirsgirêkan nehatiye kirin, lê çareserî diyar e ew jî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê ye." WASHINGTON



Trûmp alîgirên xwe sor kir û bû sedema tevliheviyê

Li Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) ji bo serokatiya 46'emîn Joe Biden hatibû hilbijartin. 6'ê mehê, ji bo dengdana serokatiya Joe Biden ê hilbijartî sanator li kongreyê civiyan. Donald Trûmp jî mitîngelê li dar xist û bang li alîgirên xwe kir ku li dijî encamên hilbijartinê derkevin û xwest civîna li kongreyê asteng bike.

Bi banga Donald Trûmp re alîgirên wî bi ser kongreyê de girtin û xwestin aloziyê derbixin. Her çiqas avahiya kongreyê ji aliyê polîsan ve hatibû girtin jî

alîgiran dîwar û barîyerên polîsan derbas kirin û ketin avahiya kongreyê. Di encama vê aloziyê de 4 kesan jiyana xwe ji dest da, 14 polîs birîndar bûn û bi dehan kes jî hatin binçavkirin.

Piştî li Amerîkayê gel bertek nîşanî Trûmp da û xwest ew îstifa bike. Di encama van bertekan de Trûmp jî li ser hesabê xwe yê medyaya civakî banga arambûnê kir û wiha got: "Serî li şîdetê nedin û ji bîr nekin ku em partiya qanûn û nîzame ne. Rêz li qanûnan û jin û zilamên ku bi unîforma ne bigirin." Her

wiha Trûmp daxuyaniyek da û diyar kir ku dê 20'ê çileyê li gor rê û rêzikan pey-wira serokatiyê radestî Biden bike.

Ev bûyera di dîroka DYA'yê cara yekê ye diqewime, ji aliyê Netewê Yekbûyî, Îngilistan, Fransa, Yekitiya Ewropayê û gelek welatên din ve hat rexnekirin. Çapemeniya cîhanê, rojnameyên wek 'The Guardian', 'New York Times', 'Financial Times'ê ev bûyer wiha pênasekirin: 'Trûmp çeteyan sor dîke', 'Roja Darbeyê', 'Şeytanê ji agir'. WASHINGTON





Yaqûb Axa: Serhildana Dihê¹



Mem Avba

Roma xayin her tim di şerê li dijî rûs, fransiz, îngilîzan de em bi tenê hiştin, bêbextî kir û piştta xwe da me û reviya. Me ev welat rizgar kir lê ew li ser rûniştin. Bi Lozanê jî bi hevalbendên xwe re rûniştin, welatê me kirin çar parçe

Axayê gelek gundên li quntarê çiyayê Çiravê bû Yaqûb Axayê Garisî. Di nav eşîra Garisan û eşîrên derdorê de ji ber xisleta xwe ya comerd, dilsoz, girêdayî ax û miletê xwe, li herêmê dihat hezkirin. Nedişîbî axayên dîtir. Xwedî soz û bext bû, xayintî û bêbextî li balê nîn bû. Ji babê xwe ne axa bû, otorîteya xwe ji kesayetiya xwe, girêdana xwe ya nixên ehlaqî û civakî digirt, ango nûner-tiyeke wî ya xwezayî di nav civakê de çêbûbû.

Ji rûçik û awirên wî dixuya, gelek bi hêrs bû. Dema ji êlekê xwe yê kosta saetê pê ve dahelayî qutiya cixarê derxistî, destê wî dilêrîzîn. Civata li dîwana koşka wî rûniştî, bê tebat li bendê bûn ka dê çi bêje. Serê wî di ber de bi awirên tûj, ji qutiya zivîn pince titûn derxist û xiste qelûnê. Paşê qutî dada danî ber xwe û ocaxa li kêleka xwe nihêrî, maşika li ber ocaxê girt, agir tevda, pizotekî agir bi serê maşikê girt û titûna di qelûnê de pêxist. Hilmeke kûr jê kişand, paşê serê xwe yê di ber de rakir û li ser civata rûniştî gerand û got:

“Heta beriya çend salan Roma xayin li ber deriyê me dest li ser destan lava ji me dikir û digot, ‘Em ji yek umetê ne. Gawiran welatê me dagir kiriyê. Werin em bi hev re gawiran ji xaka xwe derxin û li welatê xwe bi biratî û azad bijîn...’

Bi Romê xapiyan

Yaqûb Axa, piştî van axaftinên xwe hiş bû, awirên xwe zivirandin ser çiyayê Herekolê ku navsera wî digiha ewran. Kîjan çiya, kîjan ax dixwaze ku mirov di bin dagirkeriyê de bimîne! Lewma ji Herekolê şerm kir, awirên xwe zivirand ser civatê û domand: “Ma dê kengî aqilê me yê di çavê me de bikeve serê me! Em, bi derewên Romê xapiyan. Me şer kir û xwîn rijand li seranserê vê axê. Piştî ku karê wan bi me qediya vêca dest pê kirin û gotin; ‘Kurd tune ne. Kurd tirkên çiyayî ne!’ Zimanê me qedexe kirin. Di êrişî dagirkeriyê de kindirê sêdarê li stûyê me hemûyan bû. Me kindirê stûyê Roma

xayin deranî, lê belê wan pihên li kur-siyê li binê lingê me da, bêbextî û xayintî li me kirin. Ew Roma Reş, niha bi dagirkerên ku ji wan re digot ‘gawir’ mil bi mil, li ser maseyan rûdinin, li ser me peyman datînin, êrişî me û nixên me dikin. Me, ev ax ji destê gawiran, ji bin dagirkeriya wan deranî lê belê sed rehma li gawiran..!”

Paşê Yaqûb Axa kesereke kûr kişand, ‘xwezî’ got û hiş bû. Dîsa weke bazekî awirên xwe li ser civatê gerandin. Baweriya wî ya misilmantiyê dest avêtibû pêsîra wî berne-dida, lê belê dîsa jî gotina xwe tefsîr nekir:

“Xwezî em bi gawiran re jiyabûna lê me bi van tirkên ji me re digotin,

‘em bira ne, ji heman umetê ne’ mil bi mil şer nekiribûya. Yê ji wan re digotin ‘gawir’, qet nebe xwedênas bûn, lê mixabin xwezî nagihên xweziyan...”

Bûyera dilêş a du meh berê li Dihê di serê wî de qewimî, hat bîra wî. Ma dê çawa ji bîr bikira ev şerma mezin heta ku baniya bîra xwe, her kêlî û dem di bîra wî de bû, wijdanê wî, rûmeta wî diguwaşt!

Yaqûb Axa dê biçûya bajêr. Seyîs, mehîna wî ya boz a rehwanî bi zîn û xemlê amade kiribû. Kî mehîna ku gulivankên hevser û rişên zîna wê bi hunerî hatî rêstin, guliya wê li her du aliyên weke biskan dahelayî didîft, bi heyranî li vê mehîna ku ji dîrok û heybeta kalikên Yaqûb axa Medan mîras mayî, dinêriya.

Yaqûb Axa kefiyê xwe, li gorî çand û kevneşopîya kurdîni kir kofî û li serê xwe pêça. Piştîka xwe ya ji tevna kurdî hatî honandin, li piştta xwe girêda û xencera xwe ya destikê wê bi ziv û sedefê nexşekirî xist ber piştîka xwe. Paşê saeta kostekî ya ji babê wî mirate mayî, ewilî vekir lê nihêrî, piştîre girt û xist kûrika êlekê xwe. Simbêlê wî yê reş, li rûyê wî yê esmer ku ji ber tava welêt weke pola hişk lê bi mexrûr dixuya, giranî û rêzdariya wî ya heyî zêdetir dikir. Hefsarê mehîna rehwanî ji seyîs girt û bi carekê xwe avêt ser zînê lê siwar bû û lingê xwe hêdika lê hejand. Mehîna wî mîna ku ji zimanê wî

fêm bike, ji nişka ve da xwe. Mehîna ku dûvê xwe rakirî mîna ku simên wê erdê negirin bi çargavî beziya. Sim û nalên mehîna wî, toz û dûmana axa Garisan ku li ber tavê dişewitî li pey xwe radikir.

Cil û bergên kurdî

Yaqûb Axa, dema gihîşt bajêr, li hemberî dîmenê dîtî şaş ma, dirûv û şiklê mirovan guherîbû. Bi ecêbmayî di ber xwe de got ‘ev çi bi cilê miletê hatiye wiha, her kesî cil û bergên çewtûmewto li xwe kirine?’ Li ser tu kesî cil û bergên kurdî tunebûn; li serê her kesî li şûna koviya kurdî, şepqeyên rengûreng hebûn. Bi şaşwazî ji mehîna xwe daket, bir hefsarê mehîne bi rizda deriyê xanê ve girêda û ji bo vê rewşa sosret fêm bike ka çi bûye, berê xwe da nav xanê. Bi ketina hundir re silav da çend kesan û rasterast ber bi xwe-diye xanê ve çû û piştî silavê got: “Xêr e heyran. Ev çi hal e? Çima cil û bergên kurdî li ser kesî nînin?”

Xwediyê xanê fêm kir ku haya Yaqûb Axa ji mijarê nîne, lewma got: “Ma haya te jê nîne? Misto Kemal fermann deraniye. Gotiye xeml û girêdana we li derveyî şaristaniyê ye, lewre êdî dê tu kes kefiyê nede serê xwe, şal û şapikên kurdî li xwe neke; dê her kes cilên ‘medenî’ li xwe bike. Ji bo ku miletê çavtirsandî bikin gelek kes birine sêdarê, bi dar ve kirine. Diyar e agahiya te jê nîne lê ez di şûna te de bim ez ê wê kefiyê ji serê xwe deynim. Nexwe li derve mufreze te bibînin, xwedê dizane ka dê çi bînin serê te!”

Yaqûb Axa şaş û metel ma, gotinek ji devê wî derneket, tenê li xwediyê xanê guhdarî kir. Ya dilê xwe neda der. Dizanî ku hestên xwe bîne ziman dê serê wî bikeve belayê, lê belê hêrs û kîna wî gelek zêde bû. Rûspî û rêzanê eşîra Garisan bû. Hem di nav eşîra wî de hem jî li nav eşîrên derdorê gotina wî li erdê nediket. Xwedan qedr û qîmet bû. Bi gotineke wî, bi dehan mîrxasên xwe bidana kuştin hebûn. Misto Kemal çi bixwesta, ma ti karê wî nemabû ku bela xwe li cil û bergên wî bide! Ma ev xweda ne ku em çi li xwe bikin ji wan bipirsîn, tev li çanda alemê dibin!

Zilmê qebûl nake

Yaqûb Axa ji fikarên xwe serê xwe rakir û got, ‘êdî ya van kirî bese. Li ser axa bab û kalên me zilma li me kirine tu wijdan qebûl nake.’ Ji hêrsa xwe ne-

karî xwarina xwediyê xanê danî berê bixwe û bi dengê nizm got ‘kesê ku bêje ez mirov im, vê zilmê qebûl nake!’ û da xwe rabû.

Bêhna wî wisa teng bûbû ku hindik mabû singê wî biteqanda. Bi lezûbez ji xanê derket. Bi derketinê re bayê ji navsera çiyayê Çiravê diweziya li nav çavê wî û dilê wî piçekî hênik kir. Bi keviya kefiya xwe xwêdana eniya xwe paqij kir û bi fikar û gumanên hişê xwe ber bi sûkê ve meşiya.

Mîna ku ji vî dinayayê bar kiribe kûr diramiya. Heta dengê eskeran nehat, mufrezaya dora wî girtî ferq nekiribû. Li dora xwe nihêrî eskeran dora wî pêçabû, fermanarê mufrezeyê ber bi wî ve dihat. Çawa gihîşt balê, ji nişka ve destê xwe avêt kefiya serê Yaqûb Axa, avêt erdê û bi lingan da serê, di nav tozê de gevizand! Yaqûb Axa weke ku lal bibe nekarî bixave, req bûbû!

Fermanarê mufrezeyê bi dengê bilind: “Ma tu nizanî ku kefiye û şalwar hatine qedexekirin? Ji niha û pê ve dê her kes şewqê bide serê xwe, pantor li xwe bike, êdî dê tu kes van cilûbergên dij-medeniyyetê li xwe neke, qanûn wiha ye!”

Destê Yaqûb Axa ji nişka ve çû ser xencera wî ya li ber piştîka wî, lê belê bi serwestiya xwe fêm kir ku bi tena serê xwe nikare bi tevahiya mufrezeyê. Di dilê xwe de got, ‘her tiştek dema xwe heye’ û destê xwe ji xencere kişand û bi aqilane got, ‘komutan beg, haya min ji qedexeyê nîn bû. Stûyê me li ber vê qanûna hikûmetê xwahr e.’

Ev bersiva Yaqûb Axa li xweşa fermanar çûbû. Lewre êdî nexwest xwe pê mijûl bike. Mufrezeya xwe da pê xwe û bi dijûnên xwe ve ber bi sûkê ve meşiya.

Yaqûb axa kefiya xwe ya di nav tozê de mîna ku rûmeta xwe ji erdê rake, hilanî. Çavê wî tijî hêsirên janê bûbûn, lê belê li xwe dananî û negiriya. Ji xwe bixwe re got, ‘xwezî ez ketibûma bin vaxê, çêtir bû!’ Bi lezûbez zivirî ber bi deriyê xanê ku mehîna xwe pê ve girêdabû çû, hefsarê wê vekir û lê siwar bû û ber bi gundê xwe yê quntarê Herekolê ve bi çargavî bezand...

Şîrê dê li min heram be

Ji şerma xwe bi rojan ji qesra xwe derneket û gotinek ji kesekî re nekir Yaqûb Axa. Şermeke mezin bû hatibû serê wî û nikariya bi peyvyan bianiya

ziman. Lewre xwe ji her kesî îzole kiribû. Di nav jûra xwe de pêgermok digerand û digot, ‘yekî weke vî firewnê Misto Kemal careke dî nayê ser rûyê dinê. Heke ez vî wî re bihêlim, bila ev roja hiltê, berf û barana dibare, axa ez nanê wê dixwim, çiyayên ku ez zarakên wan im, heqê xwe li min helal nekin, şîrê diya min li min heram be!’

Piştî demekê xwe ji bandora wan kêliyên şermê rizgar kir, lê giyanê wî hatibû hincirandin, dilê wî eşiyabû. Vê hikûmetê jî cilûberg, ji ziman û çanda wan re dijminatî dikir, qesta hebûna wan dikir. Lewre divê pêşî li vî dijminatîya bêrûmet û bêregez bigirta.

Roja serîrakinê ye

Dîwana Yaqûb Axa bi rûspî, giregir û rêzanan tijî bû. Beriya dest bi axaftina xwe ya weke ava zelal bike, serê xwe rakir li nav çavên destebirayên xwe Şêx Evdîrehmanê Garisî, Gurgîn Axa û Pîr Êzdîn Axa nihêrî. Her yek ji wan ji bo wî weke çiyayekî bû, ji wan hêz girt û di dilê xwe de got, ‘mîrov bi hevalên xwe yê rast re biçê mirinê jî xweş e!’ Paşê li bejin û bala her du kurên xwe yê çeleng ku heybeta xwe ji çiyayê Herekolê girtibûn Yûsîf û Xelîl nihêrî, bi wêrekî û dilsoziya çavên wan axivî:

“Dema gawiran welat dagir kir, şer hat ber derî, cengawerên kurd singên xwe kirin mertal û welat parastin. Roma xayin her tim di şerê li dijî rûs, fransiz, îngilîzan de em bi tenê hiştin, bêbextî kir û piştta xwe da me û reviya. Me ev welat rizgar kir lê ew li ser rûniştin.

Di peymana Lozanê de jî bi hevalbendên xwe yê gawir re rûniştin, welatê me kirin çar parçe, pêşkêşî dewletên dagirker kirin û gelê me tune hesibandin. Jixwe hûn hemû doza mafdar a Şêx Seîd a li dijî vî feraseta qirker dizanin, ka çi anîn serê wan.

Îro jî ziman, çand, heta cil û bergên em li xwe dikin jî qedexe dikin, bi darê zorê ji me dikin, dest dirêjî nixr û rûmeta me dikin. Roj roja serîrakinê ye. Heke em li dijî vî dewletê serî ranekin, em ê çawa li ser vî axa pîroz bigerin, li van çiyayên binêrin û derkevin nav xelkê xwe!”

Gotinên Yaqûb Axa bandor li hemû civatê kiribû, dilê wan lerizandibû. Çimkî li gorî çanda wan şikestina rûmetê, ji mirinê xirabtir bû. Lewma di dawiya civatê de bi hev dengî, li dijî rejîma Misto Kemal biryara serîrakinê hatibû girtin... (didome)

Ziwanê sero çand vateyê nêmcetî

Estareyo Aliqanaye

Helbet ina babete sero zafê çî vacî-yeyî. Zafê çîyê ameyî nuştîş. Her kes kinarêk ra ina babete girewt xo dest û sero qal kerd. Wexto ke ma, çîyo ke ameyo nuştîşî rê ewnîyênî, kam ziwan de ameyo nuştîş wa bêro, xûsusen ehemîyetê ziwanê sero vindarîyayo.

Tarîx de milleta ke bêziwanî ci-wîyaya çin a. Semedê sey yew millete ciwîyayîş, ziwan her daîm şert bîyo. Semedê milleta xoserî bîyayîş zî ziwanê xoserî şert bîyo. Ewtîya de ma behsê millet kenê. Dewlet ney. Dewlete beno ke wayirê zaf ziwanan ba. Ziwan, semedê dewlete ra şerto organîk nîyo. Labelê semedê milletbîyayîşê ra şert o.

Ziwan millete payra edilneno. Dewomkerdişê cûya millete, wesîleya ziwanî reyde mûmkûn a. Endamanê millete pê ziwanî yenê têhet. Eynî hîsan ciwîyenê û beyntarê înan de têkilîya xort virazîyena. Yanî kesê ke eynî ziwanî qal kenî, eynî çîyan reyde şa benê û eynî çîyan reyde xemgîn benê.

Heto bîn ra ziwan, sîstemê fikirî-yayîşê milletan nawneno. Senî fikirî-yayîşê yew merdimî ziwanê eyde belî beno, eyn wîna zî fikir û fikirîyayîşê millete ziwanê ya de eşkera beno. Millete senî fikirîyena û çî fikirîyena ziwanê ci de xo nawneno. Tene ino zî ney, qehr, şayî, dej û hîsê milletan, ziwananê înan rê tesîr kenê. Ino xususê rê nûmuneyo tewr mûhm, vateyê verîn û îdyomê milletan ê. Ma vacî yew millete eke tarîx de zafanê cotkarîye ver şuxulîyaya, wexto ke merdim ewnîyeno, veyneno ke îdyom û vateyê verînê a millete zafanê cotkarîyeyî sero ameyî vatîş. Ziwanê a millete tewr vîş, babeta cotkarîye de dewlemend bîyo. Eke ma nûmune bidê, milleta kurd zî wîna yew millete bîya. Ma vacî, wextê verinan de traktor çinê bî û kurdan pê "Alate" cit kerdinî. Yan gayan ra bestinî yan zî estoran ra. Ina alate yekpare nêbî. Çand parçeyan ra ameyî meydan. Wexto ke merdim destpê kenê, parçe û qîsmê alate waneno, nîzdîyê vîst heb name waneno. Nêre, birke, qetbe,

Ziwan çande mûhmîmo, şuxulnayîşê ziwanî zî ande mûhmîm o. Qederê ziwanî, destê endamanê a millet de yo. Ê endamê çande wayirê ziwanê xo vecî, o ziwan ande dewlemend beno û aver şîno...

fale, qebze, bewse, rişte, palet, kelme, xenqe, mosla, maçe...ûsn. Seke ino nûmuneyê ma de zî aseno, têwgeyrayîşê yew millete ziwan de belî kenê. Heto bîn ra ziwan zî derheqê têwgeyrayîşê yew millete de malûmat dano merdimî. Riyê ino ra ma zaf rehet eşkenî vacê ke, averşîyayîşê yew ziwanî, xebat û xebatkarîya a millete reyde mûmkûn o. Yanî eke yew millete bixebetîya, çîhat biba û newe çîmetan bîyara meydan o wextê çîyanê neweyan ko pê ziwanê xo bikar bîyara. Ino zî ziwan aver beno û keno dewlemend.

Peynî peyen de ma rehet şîne vacî ke şertê milletbîyayîşê yewin, eynî ziwan qalikerdiş o. Yew komele beno ke xoserîya xo vîndî bikera. La eke a komele ziwanê xo vîndî nêkerdo, hema zî yew millet hesabîyena û mûmkun o ke sey yew milleta xoserî, biba xoser. Labelê wazenî wa yew millete wayirî çand heb dewletan biba, eke ziwanê xo vîndî kerd, edî sey yew millete nêhesibîyena. Ino xûsus sero nuştoto tirk Omer Seyfettîn se sere ra ver kovara Genç Kalemler de wîna nuştoto: "Tirkî wetanê ma yo manewî yo. Aqibetê ino wetanî, aqibetê wetanê ma yo resmî û millî ra mûhmîmêr o. Çîmkî milleta ke wetanê xo vîndî kerd, eke wayirê ziwanê xo vecîya, mehî nêbena, ciwîyena û yew roj xoserîya xo xo dest finena; dişmananê xo ra întîqamê xo gêna. Labelê eke ziwanê yew millete biheremîyo, vîndî bibo; wazenî wa xoserîya ci dewom bika, tarîx ra pank bena şîna."

Rûh û qerekerê yew millete pê ziwan eşkera benî. Ma vacî Ehmedê Xanî Mem û Zîn de tene behsê eşqê di merdiman nêkeno. Weyra de eynî wext, kûltûr û heyatê sosyal yê kurdan rê wesfeyê lîlîki veyneno. Semedê ino ra wendox, caran açarnîyîşê yew kitabe ra sey esilê ci, tehm nêgîno. Açarnîyîşî her wext nuşte ra çî kêmneno. Yanî kitaba ke zazakî nusîyaya û kitaba ke tirkî ra

açarîya zazakî qet yew nêbenî.

Wexto ke ziwanê yew millete heremîya, kûltûrê ci de zî problemê destpê kenî. Wareyê fikiran de tapayîyayîş destpê kenê. Mensûbê a millete, ziwanê xo caverdenî û sewbina ziwanan da şuxulîyênê. Ê ziwanan de qal kenî. Kûltûrê a millete roj bi roj tapa şîno. Neslê neweyî ino kûltûrî ra bêxerber manenî. Beyntarê inê neslanê neweyan û verinan de têkilî heremîyena. Sist bena. Hêdi hêdi ina rewş pêro millete sero tesîr kena. Wîna wîna beyntarê komele de qerefîyayîşê destpê kenî. Endamê komele yew ca ra pey edî yewbinan fehm nêkenî. Wexto ke înan yewbinan fehm nêke, miyanê komele de pênerdiş destpê kenê. Ino zî dişmenê ziwan û millet o. Hem ziwan apey şîno hem zî millet. Pêro inê çîyî, binameyê asimilasyon yenê vatîş.

Dişmenê milletan zî inê xûsusan zanî û semedê milletan çin kerdîşî ra asimilasyon şuxulnenî. Yanî kesê ke wazenî ye millete orte ra hewenî, edî tank û topan reyde ney asimilasyon reyde kenî. Zereyê millete ra millete helesnenî û hêdi hêdi peynîya ci anî. Yanî ziwan senî averşîyayîşê millete rê ardim keno, eyn wîna peynîya milleta xo zî ano, ê yewna millete zî ano.

Milletê ke wazenê xo mehîze bikerî, ewilî gerek paşt bidê ziwan. Milletê ke wazenê bindesteya sewbina milletan ra bixelesîyê gerek paşt bidê ziwan. Wexto ke kê dîna de xoverrodayîşê netewîyan ra ewnîyênê, kê şîne vacê ke kam ehemîyet dayo ziwan dahîna serkewte bîyo. O ko ziwan peygoş kerd, yan serkewte nêbîyo yan zî erey bîyo.

Kinarêk ra îcab keno ke ma têkilîya kûltûr û ziwan sero vînderî. Kûltûr eke pêserbîyayîşê zanayîşî yo, çîmeyê ino pêserbîyayîşî zî ziwan o. Yew kûlturo averşîyaye û dewlemend, ancak yew ziwanê dewlemend reyde mûmkun o. Ziwanê komele, kinarêk ra kûltûrê endamanê komele nawneno.

Nuştêkî beno fekî beno, pêro çîyê ke yew millete pê ziwanê xo ardo meydan, miyanê kûltûrî de yo. Heta ke nuşte hetê insanan ra veynîyayo, kûltûr pê fekî ciwîyayo. La veynayîşê nuştêyî dima kûltûr dahîna rehet û asan neql bi. Averşîyayîşê kûltûrî sero havîla nuştîşî, nêhesebîyena.

Ziwan eynî wext ganî yo. Yanî tarîx miyanê de bedilîyeno. Tayê çekuyê ci mirenî. Dermanê ino zî helbet nuştîş o. Ziwanê ke ame nuştîş, rew rew nêbedilîyeno. Vîndî nêbeno. Millete çande mûhtacê ziwanê, ziwan zî ande muhtacê nuştîşî yo. Wexto ke merdim çîyo nuştêkî waneno, wazenê wa ay nuşte 500 serre bibo şîno o nuşte hîs bikerê. Hîsanê ê dewrî biciwîyo. Ziwan wîna beyntarê dewrê tarîxan û insanan de sey pird, wezîfe veyneno.

Ziwan çande mûhmîmo, şuxulnayîşê ziwanî zî ande mûhmîm o. Qederê ziwanî, destê endamanê a millet de yo. Ê endamê çande wayirê ziwanê xo vecî, o ziwan ande dewlemend beno û aver şîno. Semedê ino ra gerek her millete, ziwanê xo bandora ziwananê xerîban ra bipawa. Eya, miyanê ziwanan de her tim têkilî esta û ko biba. Labelê gerek sewîyeya ina tekilî estbiba. Wexto ke yew ziwan destpê kerd ziwanê binê sero hûkmê xo rona, edî ina tekilî nêbena. Asimilasyon beno. Ina babete de têwgeyrayîşê roşnîr, hûnermend û sazgehanê a millete rolêko mûhmîm teşkil keno. Gerek înan, her kes ra vîşêr ehemîyet bidê ziwanê xo. Eke ma tîya de rewşa kurdî de yew parantez abikerî, ma şîne vacî binê tesîrê sewbina yew ziwan de yo. Hetê hûnermend û roşnîrnan razî bêwahîr mendo. Hûnermend esto ke, heta şew kurdî sero xebetîyeno la gedeyê xo reyde tirkî qal keno. Ma ina wesîla reyde rehet şîne vacî ke ziwan tene mûhtacê zebat nuştîşî nîyo, mûhtacê qal kerdîşî zî yo.



Dewey Ma

Cemil Oguz

cemilo@diyarname.com

Qasê şîmşêrî dûrî vindere

Perê cêrînê panlemana Brîtanîya "House of Commons" (belkî merdim eşkeno zey "Kê ê cêrînan", yan zî "Kê şarê cêrîn" açarno. Tirkan zey "Avam Kamerasi" açarnayo) esta. Qasê 800 serre verî nûneranê şarî hameyne ewca meselay nîqaş kerdêne. Zey panlemana ewro bî. Ê nûnerê şarê wexto hameyne helbet bî şîmşêrî xo hameyne. Wextê nîqaşî de semedo nêşka vera yew şîmşêrî xo nêanco û yê bînî birîndar nêkero, yan zî nêkişî miyanê înan de xetî hamey antişî. Ê xetî dewrê 2 metrew û nîm têra dûriyê. Ê nûnerî, ma zey ewro vacinê mebûsî a xete ra nat niyameyne, derbasê heto bîn nêbîne. Ê xetî miyanê "House of Commons" de bi name û vengê. Dinya de zî wexto yew qalê miyanê çîke keno vano "Qasê şîmşêrî dûrî vindere".

Qalê Brîtanîya Edwardo 2'ın roja 30.10.1313 de veydeno nûneran, wexto ê yenê miyanê înan de reyna pêrodayîş virazêno, nay ser, ew bî şîmşêrî hamiyayîşê miyanê "House of Commons" qedexeyê qeybî şîmşêrî û zirxê înan dolaban înan rê virazeno. Hendî mebûsî ê şîmşêrî zîrxanê xo ewca daleqnenê û yenê miyanê panlemene.

Helbet verê înan zî dinya de panlemenî bîbî. Brîtanîya de qîmetêke pîl dawo panlemene û nîqaşanê miyanê panlemenan. Ewro zî ê qîmet danê pareleme. Bîyarê xo bî nîqaşan girotê, nê bî şer û pêrodayîşî; ewro zî bîyarê xo bî eno tewir gîne.

Her serê ke raver şî, dinya de panlemenî û hukmê panlemenan biyo xurt. Enka dinya de îstîsna nê tede heme welatan de panlemenî estê û welatê ke panlemenê înan xurtê ê welatî zehf raver şîne.

Miyanê kurdan de panlemene

Miyanê kurdan de, kurdê Başûrî serra 1992'ın de panlemene virazênê, la panlemene înan nêbena rengîne. Her bi serê partiyan de, û bi vatîşê pîlê partiyan raver şîna. Semedê hukmê panlemene endêke zêde nêbiyo, miyanê înan de zî her problemî virazîyayê û dewam kerdê. Mesela serra 2015'ın de Hikumetê Başûrî hamiyayîşê Serokê Panlemene qedexeyê kerd. Serokê Panlemene serî nêşka şoro Hewlêr. Erê Serokê Panlemene esto, la nêşkeno şoro panlemene. A çaxî a çî panlemene?

Tirkîya de panlemene

Serranê peynan de Tirkîya de qîmetê panlemene biyo kemî. Verî hikumetan her serê sere hesab dayne "Danîştay" û helbet panlemene. Enka reyna her serre nîqaşî virazênê la zehfê reyan hesab nêdanê. Loma zî qîmetê panlemene miyanê şarî de biyo tay, bawerî şarî bi hikumetî biyo tay.

Amerîka de panlemene

Amerîkane de zî panlemene esta. Bi namey xo Senato. Senato de kursî kamco partî zêde bê di bîyar girotîşî de ê hakim ê. Xo ra ewro qeybî ene Senatoya Amerîka ma waşt ene nişte binîsînê. Weçînayîşê DYA (Dewleta Yewbîyîna Amerîka) de Joe Biden bî ser kewt, la Serokê enqay Trumpî her qalê hîle û çî bînî kerd; zeg nêwaşt raye teslîmê serokê newî bikero. Roja 06.01.2021'ın de partî Trumpî mîtingêke viraşt û veyda şarê xo ke wirzê piyan. A joy ser henî hetgirotêyê Trumpî kewtî Senato, bi çekan Senato girot dest. Pêrodayîş viraziya, jo te ra polis 4 tenî hameyî kiştî. Ene joy ser hemberê înan û partiye Trumpî reaksiyonî bî pîlî. Cigirê Trumpî bi xo zî eno êrişê Senato qebûl nêkerd, Trump mecbûr mend serkewtîşê Bidenî qebûl bikero û vaco "20'ê aşme ez o raye teslîm bikerî." Şarê Amerîka wayîr ro Panlemene xo, yanê Senatoy xo veciya. Êrişê serê Senato de zey barbarî hame qebûlkerdişî.

Şar wayîr ro panlemenanê xo vecênê, çîmkî ewca şarî temsîl kenê. Ê ke qîmetê panlemenan bikerê tay ewca demokrasî bena vila, tedir hizurê şarî zî beno vila. Enî çî qeybî ma zî derbas benê.



Monologa pirtûkeke bêbext

Çima bala kesî nakîşînim, çima kes min naxwîne? Ma min çi sûc kiriye? We nedixwend, qene we nestanda. We hêvî da min, bi dû re jî bi salan wek girtiyar we ez di wan refikan de hiştim. Çi ferqa we ji faşistên ku pirtûkan dişewitînin ma? Qene ew dilsoz in, dibêjin em hez nakin û naxwînin; lê hûn, hûn ê ji bo pirtûkan xwe birçî bihêlin û bi perên xwe yê dawî pirtûkan bistînin, lê tenê li bergê binêrin, pêşgotinê bixwînin û hew.

Yaw ma hûn qet nabêjin, di hindurê vê pirtûkê de çend kes hene ku bi xwendina we hebûna wan watedar dibê. Dibe ku ez pirtûkek qet nebaş bim, lê we hê nexwendîye, hûn ê çawa bizanibin? We ji ku derê bihîst ku ez nebaş im, hema kî çi bibêje hûn ê bawer bikin?

Pêşiyê bixwîne, bi dû re dikarî bişewitîni, bi soz, ez ê nexeydim, lê li vir bi wan hêviyan (hêviya ku tu yê rojekê werî min bixwîni) min nehêle. Min bixwîne, bi dû re "fermo êdî tu dikarî min bikujî".

Diyar e ku keçekê yan jî lawikekî ku we dil berdayê, ez pêşniyar kirime... Lawo, ma we tiştê derheqê evîne nexwendîye? Dizanîm, mijara vê pirtûka ku çend bihost ji min dûr e, evîne.

Tu li wir tîkiliya evîne û rastiyê fêr nebûyî; hûn çima nerast in ji evîndarên xwe re? Eger hûn ji pirtûkan hez nakin, ji hevalên xwe re bi rehetî bibêjin top li we ketno... Ji ber derûniya we ya tewşomewşo çend hevalên min wek marê çolî seran ketiye, dijîn. Rûpelên wan zer bûne, ev deh sal in hinek rûpelên wan jî ji ber şaşiya çapxanê bi hev ve zeliqîne. Hûn dizanin deh lehengên min hene, her deh jî ji we pir nefret dikin. Deh sal in ev deh lehengên bêşûc di nav vê refikê de qet neaxivîne. Di nav me de yekî kelkelo heyê û dizanî niha ew ji ber tiraliye te lal e, nikare biaxive.

Min çima evqas şor kir dizanî, ev çend sal in difikirim, lê bes e! Îro roja çalakiyê ye, teqez ez ê bikim. Nexeyide. Vî tiştê ku dikim ji bo te ye jî. Dizanîm tu yê dîsa pirtûkên tu yê nexwîni bistîni, lê çi bikim, ez hew debar dikim. Va ye te dîsa kufrîd li nêzî min ji bîr kiriye. Çend carên din jî derfetên wisa ketin destên min, lê min got belkî tu biguherî, tu bibî mirov, lê nebû, tu her çû xerabtir bûyî. Bes e. Ez ê xwe û hevalên xwe gişan bişewitînim. Ew ê alavên te yê din jî zerarê bibînin, lê çi ji min re. Kelkelo kufrîdê bîne, tamam, aferim ji te re. Ev agir belkî pozê te jî bişewitîne xwediyê min!

Eliyê Xemxwir



Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Em bi hêvî ne ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe re tiştên li ba xwe binvîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

1- Mamê mino mamani
Guleke qudrê, hem sax, hem mirî bi kêrê me tê.
Kî dizane ew çi ye?

2- Tiştê min heye
Gurî ket nav firqarê, min berdayê bi şirmaqê.
Hûn dizanin çi ye?

3- Tiştê min heye
Hanikê manikê firsê derê kanîkê rê nade heywanîkê.
Ew çi ye gelo?

Çavkanî: Hilmi Akyol

Bersivên me ev in:
1- Pemoû 2- Sabûn 3- Qeşa

Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin.

De werin em dest pê bikin û pîrsa xwe ya her tim bipîrsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:

Lekim çê, lekim çê, lekim çê

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:

Lê li rê, rê li lê


→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:

Mast dibe çeçilmast
Çeçilmast nabe mast
Mast xweştir e ji çeçilmast

Çavkanî: Mihemedê Kurdo



XAÇEPIRS




JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- Hişk, xav, ne ter 3. Pêxemberek 5. Navekî lawan bi wateya serbest
- Bajarekî rojhilatê Kurdistanê 7. Navçeyeke Amedê
- Lêşorkirin, lêgurkirin 12. Heywanekî ku bi xap û fenên xwe lehengê gelek çirokan e
- Rih, mûyên rûyê zilaman 15. Gelekî cîranê kurdan
- Wiha, her wiha dengêkî gazîkirinê 18. Bersiva neyênî
- Xwarineke ku ji ard, xwê û rûn tê çêkirin, şorik

JI JOR BER BI JÊR

- Rûbar 2. Navekî jinan
- Cejin
- Cihê ku genim lê tê hêran
- Navê jineke ku bûye sembola berxwedana Kobanê
- Zaravayekî kurdî 8. Bazdan
- Koka kurdan û hin gelên din
- Ar
- Dewleteke ku navê wê bi darvekirinê tê naskirin
- Celebeke hespan a bezek
- Gêj, serxweş
- Erdê ku tê avdan, ne bejî
- Hejmarek
- Noteke muzîkê
- (Bi inglîzî) Kurtasiya erê, belê, tamam

Bersiva hefteya borî



Li pirtûkxaneyên dewletê 25 destnivîsên bi kurdî

Navenda Nûçeyan

Wezaretê Çand û Tûrîzmê bersiv da pêşnyarpirsa parlamentê HDP'ê Mûrat Sarisaç û diyar kir ku li pirtûkxaneyên girêdayî wezaretê 25 berhemên kurdî yê destnivîs hene û kesên dixwazin dikarin ji van berheman sûd werbigirin

Bi salan e zimanê kurdî bi zextan re rûbirû ye. Tevî van zextên dijwar jî berhemên bi destan hatine nivîsîn gihîştine roja me ya îro. Parlamentê HDP'ê yê Wanê Mûrat Sarisaç, bi pêşnyarpirsekê berhemên bi kurdî yê ji sed sala 16'ê emîn û vir ve hatine nivîsîn û pirtûkxaneyên lê ne anî rojê meclîsa Tirkiyeyê. Mûrat Sarisaç xwest Wezîrê Çand û Tûrîzmê Mehmet Nûrî Ersoy pirsên wî bibersivîne. Pirsên hatine pirsîn ev in;

*Berhemên bi destan hatine nivîsîn ku beşek girîng a wêjeya klasîk a kurdî ye (kurmançî, kirmancî, soranî, goranî, lorî) niha li kîjan pirtûkxaneyan in?

*Li Tirkiyeyê çend berhemên kurdî yê bi dest hatine nivîsîn hene? Ev berhem li kîjan pirtûkxaneyan in?

*Gelo têkildarî lêkolînên destnivîsên kurdî arşiv hatine parvekirin an na? Gelo di kîjan şert û mercan de ji arşivan sûd tê wergirtin.

*Tê gotin ku hinek berhemên kurdî ji ber peyven 'kurd / Kurdistan' hatine texrîbkirin, ev agahî rast e yan na?

*Têkildarî berhevkirin û katalogkirina destnivîsên kurdî xebat û plansaziyek heyê yan na?

*Li pirtûkxane û arşivan ji bo tasnîfkirina berhemên kurdî gelo çend zimannasên kurd hatine peywidarkirin?

Wezaretê bersiv da pêşnyarpirsa ji aliye Sarisaç ve hatiye amadekirin a bi hejmara 7/29558 û ragihand ku li van pirtûkxaneyan destnivîsên kurdî hene; Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê, Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Millet, Midûriyeta Berhemên Nivîskî ya Herêma Konyayê, Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Ziya Gokalp.

Wezaretê diyar kir ku kesên dixwazin dikarin bi rêya internetê xwe bigihînin berheman û pirtûkxane di xizmeta lêkolîneran de ne. Wezaretê têkildarî hemû berheman katalogan amade dîke û xebatkarên wezaretê yê kurdî dizanin hene.

Li pirtûkxaneyên girêdayî wezaretê bi giştî 25 berhemên kurdî yê destni-

vîs hene û ev in;

-Nehcu'l-Enâm; nivîskarê/a berhemê nayê zanîn, cihê hatiye nivîsandin nayê zanîn, berhem di sala 1320 (hîcrî) hatiye nivîsandin û niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Eş'ar be ziman kurdî; nivîskar Ahmed Cizîrî û Ahsen, cihê hatiye nivîsîn Bexda ye, sala hatiye nivîsîn 1967 û berhemên niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Şê'r be ziman kurdî; nivîskar Ahsen û çend helbestvanên din, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Akîdû'l Kurdî; nivîskar El-Kutumî û B. Ya'kûb, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Mevlûdû'l Nebî; nivîskar Mola Bakî, Sa'deddîn Mola Ahmed B. Haci Mahmûd El-Licevî, cihê hatiye nivîsîn nayê zanîn, di sala 1215 (hîcrî) de hatiye nivîsîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Terkeb; nivîskar Muhammed, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Rîsale di Mevzû'î Zarf; nivîskar Muhammed, cihê hatiye nivîsîn nayê zanîn, di sala 1960'î de hatiye nivîsîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Nehcu'l Enâm; nivîskar Mela Halîl Sî'irdî; cihê hatiye nivîsîn nayê zanîn, di sala 1339 (hîcrî) de hatiye nivîsîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Dîvan; Şêx Ahmed B. û Muhammed El Cezerî, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Silêmaniyê ye.

-Husrev û Şîrîn; nivîskar Nîzamî-şî Gencevî (pirtûk wergerî kurdî bûye), dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên

Nivîskî ya Millet e.

-Dîvan; nivîskar Nalî, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Millet e.

-Lûgatçe (bi farisî wergerî kurdî kirine); navê nivîskar, cihê hatiye nivîsîn û dîrok nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Millet e.

-Muntehebat-i Eş'ar-i Kurdiyye; nivîskar Emîn Feyzî yê Silêmaniyeyî, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Millet e.

-Kîtabuzzuruf; nivîskar Abdulazîz, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Midûriyeta Berhemên Nivîskî ya Herêma Konyayê ye.

-Rîsale fî'n-Nah; nivîskar Abdulazîz, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Midûriyeta Berhemên Ni-

vîskî ya Herêma Konyayê ye.

-Şerhû Avamîlî'l-Mîe; navê nivîskar, cihê hatiye nivîsandin û dîrok nayên zanîn û berhem niha li Midûriyeta Berhemên Nivîskî ya Herêma Konyayê ye.

-Lûgat; navê nivîskar, cihê hatiye nivîsîn û dîrok nayên zanîn û berhem niha li Midûriyeta Berhemên Nivîskî ya Herêma Konyayê ye.

-Rîsaletu'z-Zurruf; navê nivîskar, cihê hatiye nivîsîn û dîrok nayên zanîn û berhem niha li Midûriyeta Berhemên Nivîskî ya Herêma Konyayê ye.

-Nev-Buhara Biçûkan; nivîskar Ehmedê Xanî, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Ziya Gokalp e.

-Rîsale fî'l-Aka'îd; nivîskar Ehmedê Xanî, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Ziya Gokalp e.

-Nev-Buhara Biçûkan (ev berhem 2

caran hatiye nivîsîn û lê hejmara qeyda her duyan jî hev cuda ye); nivîskar Ehmedê Xanî, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Ziya Gokalp e.

-Rîsale fî Beyanî Erkani'l-İslam; nivîskar Ehmedê Xanî, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Ziya Gokalp e.

-Mevlûdû'n Nebî; nivîskar Ahmed el-Batî, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Ziya Gokalp e.

-Terkeb-i Molla Yunus; nivîskar Molla Yunus, dîrok û cihê hatiye nivîsîn nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Ziya Gokalp e.

-Terkebî İzzu; navê nivîskar, cihê hatiye nivîsîn û dîrok nayên zanîn û berhem niha li Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî ya Ziya Gokalp e.



Li Tirbespiyê şevbuhêrka helbestên gelêrî


Helbestvanên li navçeya Tirbespiyê rûdanên li derdora xwe bi bêdengî dişopandin, ji ber ku azadiya derbirîne hatibû keleçekirin, lê niha meclîsa gel piştigiriyê dide wan û hewl dide behreyên helbestvanan geş bike.

Rewşên siyasî yê her welatekî bandorê li rewşa çandî dikin, bi taybetî li welatên ku rejîmên desthilatdar benden tund li dijî azadiya nêrîn û derbirîne ferz dikin. Yek ji van dewletên zordar jî Sûriye bû ku ji aliye partiya Baasê ve dihat birêvebirin.

Bi valakirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji sazîyên ewlehiyê yê girêdayî hikûmeta Şamê, rizgarkirina herêmê jî çeteyên DAIS'ê û rêxistinên terorîst ên dîtir, avakirina saziyên Rêveberiya Xweser û amadekirina hevpeymanan civakî, tevgera çandî li herêmê geş bû.

Li bajarokê Ebû Ferî yê girêdayî navçeya Tirbespiyê, gelek helbestvanên helbestên gelêrî yan jî nebtî dinivîsîn, derketin.

Helbesta gelêrî ji hunera wêjeyî ya gel e, tê de helbestvan xîtabî tevahî mirovan dikin. Ji lewre li şûna helbesta xwe bi erebiya fesîh binivîsîn, bi erebiya gel dinivîsîn.



Taybetmendiyên helbesta gelêrî,

ew in ku helbesta erebî ya biawaz e, tê de deng û peyven gelêrî yê pir tîn bikaranîn, hene. Ev cureya helbestê li gel ereban a herî navdar e û gelek navên wê hene; helbesta gelêrî, helbesta biawaz, himênî, bedewî.

Nêzî 20 helbestvan li bajarok mane

Meclîsa bajarokê Ebû Ferî, hewl dide çand, huner û behreyên helbestvanan vejîne. Di vê çarçoveyê de, yekemîn şevbuhêrke helbestî li bajarok li dar xist.

Hevserekê meclîsa bajarokê Ebû Ferî Muhened Hebîbî têkildarî mijarê got: "Rewşa çand û hunerê li bajarok tune bû. Ew jî bi sedema paşguhkirina wê ya bimebest bû, lê tevî wê jî hejmareke mezin ji behreyên hunerî û

wêjeyî hene."

Hebîbî wiha domand: "Em wek meclîs piştî me rewşa herêmê lêkolîn kir, me dît ku gelek behre hene û nehatine aşkerakirin, lê me biryar da ku em xwediyên van behreyan bi rêya li-darxistina çalakîyan teşwîq bikin û di demên pêş de çalakîyên dîtir li dar bixin."

Qusey Hebîb jî helbestvanê navçeyê ye û di helbestên xwe de azarên li herêmê çêbûn, vegotine. Li aliyekî din jî Qusey Hebîb di helbesteke xwe de bersiva kesên li dijî Rêveberiya Xweser û neteweya demokratîk sekînine, dide.

Li aliyekî din jî vegera li wan şevbuhêr û rûniştinên helbestî jî şênîyan re girêdana wan bi rewşa helbestê diyar dikin.

Macid Cerbû yek ji helbestvanên ku tev li çalakîya helbestî bûye wiha got: "Derbirîna behreyan û balkişandina li ser wê, ji helbestvanan re teşwîqek e. Da ku bi pêş bikevin, bi taybetî ku herêm di serdemeke paşguhkirinê re ji aliye hunerî û fikirî ve derbas bûye. Bi wê re helbestvan bi rêya nivîsîn xwe hewl didin rewşa ku herêm tê re derbas bûye, bigihînin civakê." **TIRBESPI**

Şûnwarên rûxiyayî zindî dike

Şêwekar Ehmed Cemal li bajaroka Kifrî ya Germiyanê, bi armanca zindîkirina şûnwarên dîrokî yê deverê yê jî berxemsariya aliye peywendîdar li ber rûxîne ne, bi tabloyan wan şûnwaran zindî dike. Her wiha mala xwe vegeandiyê muzaxaneyek jî bo kelûpelên dîrokî.

Şêwekar Ehmed Cemal bi nasnav Mame Dile, li bajarokê Kifrî yê ser bi îdareya Germiyanê ve çend salek e bi karekî hunerî hewl dide şûnwarên dîrokî yê li deverê zindî bike.

Mame Dile di mala xwe de du ode veguherandine muzaxaneyekê ku pelên kurdewar. Mame Dile tevî tabloyên ku ev çar sal in li ser kar dike, bi hezaran parçeyên keleporî berhev kiriye. Gelek ji van kel û pelan welatîyan wek diyarî



danê, gelek jî bi pereyê xwe kirîne.

Ji şewaza hunera Mame Dile re tê gotin hunera Diorama (dîmenek mezin di çarçoveyek biçûk de) ku hunereke modern e.

Şêwekar Mame Dile diyar kir, armanca wî ya vî karî nasandina bajarokê Kifrî ye ku bi gotina wî 'bajarokê Kifrî bajareke hatiye jibîrkirin e'. Mame Dile da zanîn, ew dixwaze bi vî karê xwe yê hunerî jî nîşê nû re bibêje ku bajarokê Kifrî bajarokê dîrokî ye, lê ji ber xemsariya hikûmetê şûnwarên wê yê dîrokî li ber rûxîne ne.

Keresteyên ku Mame Dile pê kar dike, ji dar, texte, burxî û madeya sikotin pêk-tên. Şêwekar Mame Dile dema dixwaze xaniyek rûxiyayî bi hunera xwe çêbike, wêneyê wî çîh dikêşe û li gorî keresteyê ku di wê avahiyê de hatine bikaranîn, di hunera xwe de bi kar tîne.

Yek ji avahiyan ku Mame Dile bi hunera xwe wê zindî kirine zvahiya Seraya Kifrî ye ku di sala 1919'an de ji aliye Îngilîzan ve hatiye çêkirin, di sala 1950'yî de hatibû nûkirin û niha jî rûxiyaye. Mame Dile têkildarî hunera xwe got, "Gelek kes ji min dixwazin, ez tiştên min çêkirine bifi-roşim wan, lê min qet fikra firotina van berhemên hunerî nekiriye." **GERMIYAN**

Paytexta dewleta Merwaniyan: Farqîn



Keştiya Alalû

Agît Yazar

Di xelexa berê de min bi sernivîsa "Paytexta mirovahiye ya yekem; Şikeftên Hesûnê" qala wan şikeftên serdema mezolîtîk/serdema kevir a navîn, kiribû û min ew şikeft, wekî paytexta mirovahiye ya yekem pênase kiribû. Gava gerokê tirk yê navdar, Ewliya Çelebî qala kurdan dike, dibêje: Kurd, neviyên Hz. Nûh in. Piştî tofanê, Şirnex, Cizir û Meyafarqîn tî avakirin.

Di vê xelexê de ez ê jî qala Meyafarqîn ango qala Farqînê bikim ku ji dewleta Merwaniyan re paytextî kiriyê.

Farqîn, navçeyê Amedê ye, lê bi dîroka xwe ya kevnare, şahidî ji guherîna gelek merheleyên dîrokî yê benîademîyan re kiriyê. Çi dîroka gelekî kevn, çi jî ya gelekî nêzîk, Farqîn her rawestegeheke girîng bûye û şopên hemû merheleyan li ser nexşeya xwe dihele.

Em jî bi dilgermî li cihên dîrokî yê Farqîna rengîn digerin. Berê me li bakurê Farqînê, li keleheke dîrokî ye. Bi qasî 13 km em diçin, em xwe di nav gundekî mezîn de dibînin, lê tiştê ku çavên min dibînin, ez jê bawer nakim. Alên Osmanî bi avahiyan xwe ve daliqandine. Te dît wan alên kesk û sê hîvîk li ser. Baweriya we hebe, ewqas alên Osmanî, li Soguta ku Osmanxaziye avakarê dewleta Osmanî lê definkirî jî, ne daiqandî ne. Ji ber ku min Sogut jî dîtîye, loma ez wanî bi teqezî dibêjim.

Diyar bû ev gundê hanê yê malên xwe bi alên Osmanî xemilandibûn, gundê qurûciyan bû.

Ev rewşa hanê, min dibe çend sal berê. Di sala 2010'î de, ez li navçeya El-malî ya bi ser Antalya'yê ve ye, dixebitîm. Rojêkê çend leşker ji qereqolê hatin dî min, gotin ifadeyê te heye. Min jî rabû xwe tevîdand û ez çûm qereqolê. Ez li hewşa qereqolê li benda bangkirina fermandar bûm.

Li bin çardaxê, çend heb çawişên pispor hebûn. Çay vedixwarin. Yekî ji wan bangî min kir û çayek ji min re jî

dagirt. Yek ji wan çawişên pispor dipeyivî û suhbet germ kiribû. Yê din jî guh di ser de pêl kiribûn.

Diyar bû çawişê pispor yê galegal sincirandibû, hîn nû ji "wezîfeya şerqê" ya mejbûrî hatibû û qala macera û bîranînên xwe dikir. Gava qala texlîdê qurûciyan dikir, devê xwe xwarovîço dikir û nola meriv qala tiştêkî pîs bike, wanî tînazê xwe bi wan dikir: "Qo-mî-tan beg! sene qeçex cixare sarex?"

Hem tînazê xwe bi wan dikir û hem jî bi aqilên wan dikeniya.

Min texmîn kir, ew bi min nizanin ku ez kurd im. Lewra, porê min ê dirêj li nav piştê min diket. Rîha min a nêrîkî, cil û bergên min yê şûtikandî, ez dişibandim zamotîrekî/tolazekî metropolan. Loma jî wan digot qey ez jî berdûşekî ji Stenbolê me, hatime havîngehan. Hasilîkelam min xwe negirt û min çend peyv li beligoşka wî çawişê pispor xist û ez jî cem wan rabûm.

Vêca meseleya qurûciyan gundê Boşatê ye. Bavo bi xwedê hûn xwe li dora serê wan jî bigerin, ji we hez nakin wî! Ma bi zorê ye!

Haylooo, me mesele anî di kur re derxist! Xwînerên ezîz, ez serê we neşînim (go serê we êşiyabe jî, paçekî lê bigerin) werin em gundê Boşatê û alên wan li vir bihêlin û em dîsa li Farqîna xwe ya rengîn vegerin.

Jixwe tu avahî di kelê-melê de nehiştine. Xaniyên xwe, li ser cihên dîrokî ava kirine. Rolyefêke siwar li ser piştê hesp, li nivê tahtê hebû. Ewqas derbê tîngê bera wî rolyefê dîrokî danbûn, ew mehû kiribûn û jê qeryabûn. Ew rolyefa niwaze ya dîrokî, edetî bi zorê dihat tefsilandin.

Farqîna Merwaniyan

Tê gotin, gava dewleta Ebasîyan ji hev belav dibe, li derdora 40 dewletên serbixwe derdikevin holê. Ji wan 30-40 dewletan, pênc heb jê ji wan ên kurdan bûne û yek ji wan dewletan, dewleta Merwanîyan bûye. Paytexta wê jî Farqîn bûye. Damezirînerê wê dewlata kurdan jî Bazê lawê Dostik e. Dewleta Merwanî, di dawîya sedsala 10'î de tê damezrandin. Heta nêzî dawîya sedsala 11'ê min jî serbixwe dimîne. Di nav sed salî de, ev merivên merd



û zîrek, xizmeteke mezîn ji milletê xwe re dikin û şahberhemên nemir ji dîroka milletê kurd a dewlemend re dihele.

Di serê sedê de, bedena Amedê zexmtir dikin û dirûvê wê yê niha didinê. Pira Deherî ya Amedê ya heta hingê gelek car hilweşiya bû, ji nû ve ava dikin. Kela Farqînê bi mîmarîyêke xweser ava dikin. Pira Mala Badê ya di cîhanê de xwedîya kemera herî mezîn e, çêdikin û navê damezirînerê dewleta Merwaniyan, Bazê lawê Dostik lê dikin. Di esasê xwe de, navê pirê ne pira Mala Badê ye; pira Mala Baz e.

Xwînerên ezîz. Hûn dibînin. Van ciwanîk û ciwanmêran, dest avêtine çî şahberhemên niwaze jê deranîne. Bêguman, mohra xwe li bin gelek avahiyan din ên dîrokî xistine. Ger em qala wan hemûyan bikin, ew ê pir dirêj bibe.

Gereke kurt rêwîtiyêke dirêj

Belê. Wexta me kurt e, lê rêwîtiya me dirêj e. Ger dar û devî bibin qelem, ava çem û kaniyan jî bibin hibir, encax têra nivîsandina dîroka me ya dewlemend bikin. Xwezî bi dilê wê/wî kesî ku bibe dilopek ji vê deryayê.

Ez carekê li dora keleha Farqînê doş dibim. Heta ber birca Zembîlfirosê diçim. Çend heb zîlamên navsere xwe avêtine ber siya kela Zembîlfirosê. Gindorfirosêkî jî erebeya xwe ya gindoran daye ber siya keleha stûr. Kalemêrekî bernas, kumê xwe li ser telê xwahr daye serê xwe. Ez dizanim ku ez di markaja awirên lêpîrsîrên ên kalemêrê bernas de me. Ez rojbixêrekê didim wan û dixwazim derbas bibim, biçim, lê ez nola masiyê sazî, di şewka kalemêrê kumxwar daliqim. Gindorfirosê jî, gindorekî hingivîn tîne li ber me zûlzûlî dike.

Kalemêr, hemû carcûrên pîrsên xwe di min de vala dike. Ez jî bi bersivên xwe yê mertalî, pîrsên kalo pêşwazî dikim. Paşê jî ez zûla dawî ya petêxa hingivîn dipîrsînim û radibim çivîr xatirê xwe ji wan dixwazim û serberjêrî keleha Farqînê dibim.

Belê, ez dixwazim li ser keleha Farqînê bigerim, lê halê kelehê ne ti hal e. Ev keleha xwerû ji hêla pêşiyên me yê dewleta Merwanî, hezar sal berê hatiye avakirin, bêxwedî maye. Jixwe dewlet lê xwedî derneketiye. Di ser de gel jî elaxêrî jî gel jî nehatiye. Goristan, avahiyan beton û keleha dîrokî li bin guhê hev ketine. Halê wê yê xerab, çizîniyê jî dilê meriv tîne.

Her wekî tê zanîn, dewleta Merwanîyan, piştî sed salî ji hêla Selçûkiyan êrîşkar ve tê hilweşandin, lê piştî 40-50 salên din, Siltan Silhedînê Eyûbî yê pêlwan radibe û hemû herêmên kurdan ên ketibûn bin nîrê Artûkiyan, paşde distîne. Serkeftina dehayê şer û siyasetê ya ewladê kurd, Siltan Silhedîn, bi

avakirina mabedên olî û avahiyan perwerdeyê yê nola kuliyê û medreseyên dêwasa, serkeftina xwe tacîdar dike.

Siltan Silhedînê kurd, du şêran li dora tacgulekê li ser keleha Farqînê dikole û mohra serkeftina xwe li dîrokê dixîne. Ger riya we di Farqîna kevnar re derbas bû, teqez herin li ber wê rolyefa şêrê şêran, wêneyekî xwe bigirin û bi serbilindî raberî heval hogirên xwe bikin.

Medreseya Siltan Silhedînê Eyûbî ya berî wefata wî pênc sal berê hatiye avakirin, minareya Qot a ji bo bikarîna gelek tiştan hatiye lêkirin (wekî re-setxane/çavdêrî û hwd) diyar e ku avahiyan li derdora wê minareya Qot a adîrokî, hatine rûxandin û gelek avahiyan din li ber çavan dikevin...

Pira Mala Baz/Badê

Kesên di ser pira Mala Baz/Badê re derbas bûne, bi awayekî heyraniya xwe, li hemberî muhtemîya wê anîye ziman. Bi rastî jî gava meriv çav li mezinahî û mîmarîya wê pira dîrokî dikeve, devê meriv ji ber mîmarîya wê ya muhtemî, vekirî dimîne. Seyahên navdar jî gelekî wesfên pira Mala Baz/Badê dane. Tê gotin ku ev pira dîrokî, bi firehî û bilindîya kemera xwe, di cîhanê de bêhempa ye.

Mîmarê fransî yê navdar, Albert Gabriel jî di wextekê de hatiye serlêdana pira Mala Baz/Badê. Di derheqê kemera pirê de gotiye, "Qubeya dêra Ayasofyayê, bi hêsaniyê di bin kemera wê pirê re derbas dibe."

Xwînerên ezîz. Werin em muhtemîya pira Mala Baz/Badê ya ji hêla pêşiyên me yê Merwanî ve hatiye çêkirin li vir bihêlin, ez ji were qala bûyereke muhtemî a jina kurd li ser wê pirê qewimiye, bikim.

Rindêxan

Di sala 1926'an de, serhildana Mala Eliyê Ünîs dest pê dike. Piştî serhildana Şêx Seidê kal, êdî Mala Eliyê Ünîs, ala serhildanê, nola meşaleyê Olîmpiyatê bilind kiribû. Dengbêj û zêmarbêj, navê Qewmê Çiyê, li malbata

Eliyê Ünîs dikin.

Piştî berxwedaneke dirêj û bêhempa, êdî şerê di çiyê de li ber têkçûnê ye. Tenê li quntarê çiyayê Mereto, deng ji kozîkekê dihat. Bi berbanga sibê re, tibabeke çeper li wê kozîkê teng dibe. Digel leşkerên dewletê, ji êvara xwedê de top û mîtralyoz li ser wê kozîkê girêdabûn jî, dîsa jî culhet nedikirin xwe bidana ser wê kozîkê.

Piştî demekê, êdî deng ji kozîkê dibile. Lewra yek berik tenê jî di rext de namîne. Leşker bi qutufnerî diçin ser kozîkê disekin. Dinêrin ya ji êvara xwedê de li ber xwe daye û qûş li wan çetandiyê, qîzeke bi tenê ye. Tê derdixin ew şepala çeleng, qîza Mihemedê Eliyê Ünîs, Rindêxan bixwe ye. Serfermandarê leşker jî tê li ser kozîkê disekine. Girêza şehwetê ji devê wî diherike û dixwaze Rindêxanê ji xwe re bibe bermaliya xwe.

Rindêxan, ji nêta serfermandar re serwest e. Lewma jî ji serfermandar re dibêje:

-Heke li ser erda mala bavê min, destê te bi min bibe, ez ê xwe bikujim!
Li hemberî çelengî û bedewîya Rindêxanê, hiş di serê serfermandar de nemaye. Ji Rindêxanê dipirse:

-Erda mala bavê te heta kuderê ye? Rindêxan:
-Heta pira mala Baz/Badê ye.

Serfermandar, qewl dide Rindêxanê ku ew ê li ser erda mala bavê wê, destê xwe bi wê neke. Heta li ser pira mala Baz/Badê, li qewl û bextê xwe xwedî derdikeve.

Rindêxan, gava tê ser pirê, cara

dawî vedigere li çiyayê Sasonê dinêre, bi dengê zelal, nola şîhandina cejniyekê diilîrîne û xwe ji jor de davêje nav ava çem. Bi vî awayî dawiyê li jiyana xwe tîne û mexseda serfermandarê tirk jî, di berkurka wî de dihele.

